



Wezîrên Derve yêن Tîrkiyê, Sûriyê û Îranê:

Emê nehêlin dewleta Kurd ava bibe

Li gor mediya Tirkiyê; hersê wezîr bê qeyd û şert gihiştine mutabeqatê ku; "Li dijî avakirina dewleteke Kurd in. Û ev hersê dewlet eger nexwazin, dewleta Kurd yan jî federasyona Kurd nikare ava bibe."

Li Kurdistan Başûr bi İlan-kirina Dewleta Federa a Kurd-re, dewletên mêtîngehkar ke-tin kefteleftê û ji bo ku biryara Îlankirinê nas nekin û vê dew-letê hilweşînin di navbera xwe de dest bi diplomasiyeke qirêj kirin.

Türkiye di vê diplomasiya gemarî de roleke sereke dilîze. Tirkîyê piştî îlankirina Dewleta Federe a Kurd bi lez û bez gazî dewletên din yên ku Kurd di bin nîrê wan de ne, kir. Bi vê armancê di 14'ê Çiriya Paşîn de li Enquerê Wezîrê Derve yê Tirkîyê Hîkmet Çetîn, Wezîrê Derve yê Îranê Ali Ekber Velayetî û Wezîrê Derve yê Sûriyê Farûk el-Şara civiyan. Herçiqas Tirkîyê gazi Erebîstana Seûdî jî kiribû, lê Erebîstana Seûdî daxwaza Tirkîyê qebûl nekir û besdarî civînê nebû.

Xalek tenê ya rojeva wezîran hebû; ew jî li dijî avakirina Dewleta Federe a Kurd ka wê karibin çi bikin bû. Li gor medîva Tirkîyê; hersê wezîr bê

Li Tirkîyê û Kurdistanê **Du huqûqên cihê**

Roja 18'ê Çiriya Paşin, Meclisa Tirkîyê qanûnek nuh qebûl kir; Qanûna Usûla Muhakemekirina Cezayê. Berê Serokcumhûrre Tirkiyê, T. Ozal hin maddeyên vê qanûnê weto kiribû û komîsyonê jî li gor wetoya T. Ozal, di hin maddeyên qanûnê de guhertin çekiribûn. Cara du-duyan, roja 18'ê mehê qanûn di meclisê de li gel guhertinan hat qebûlkirin. T. Ozal jî ev şeklê nuh yê qanûnê îmze kir.

Di qanûnê de li gor ya

Wezîrê Derve yê Tirkîyê Hîkmet Çetîn, yê Îranê Ali Ekber Velayetî û yê Sûriyê Farûk el-Şara: "Em li dijî avakirina dewleta Kurd in. Ü ger ev hersê dewlet nexwazin, dewleta Kurd yan jî federasyona Kurd nikare aya bihe "

qeyd û şert gîhîstine wê muta-beqatê ku; "Ew li dijî avakirina dewleta Kurd in. Û gava ev hersê dewlet nexwazin, dewleta Kurd yan jî federasyona Kurd nikare ava bibe." Li ser "Hêza Çakûç" jî Wezîrên Derve yên Îranê û Sûriyê gotin ku; "Bila ev hêz rabe û di şûna wê de bila dewletên herêmê.

ewlekariya herêmê bigrin ser xwe." Wêzîrên Derve yên van hersê dewletan wê di rojêن pêş de jî bicivin. Di vî warî de civîna bê di meha Sibatê (1993) de wê li Samê çêbe.

Herçiqas Tırkiye, İraqê davetî civînê nekir jî, Iraq çavekî

Dûmahîk: 11

DGM'a Enqerê îdama HEP'iyan dixwaze

Tiştê diyar ew e ku, dewlet dixwaze HEP'ê
bi carekê de bigre û xwe ji vê serêşê xelas
bike.

Piştî kongra istîsnayî ya HEP'ê ya ku di 19'ê Îlonê de li Enqerê çêbû; bi sebebê ku hin kesan di gotarên xwe de dijîtiya dewletê kirine, gelek kes hatin girtin û bi rojan li ba pûlisê siyasi man. Piştî çend rojan 3 kes hatin girtin û yên din hatin ber- met Turk, Mahmut Alınak, Hatip Dicle, Mahmut Kılıç û Ali Yigit mebûs in, di derheqê wan de dawe cihê cihê hatiye vekirin. Li gor N. Demiral, ewê fezlekeyekê bişîne ji serokê meclisê re ji bo ku masûniyeta wan bê rakirin û bêne mehkemekirin.

dan, lê di derheqê hemiyan de DGM (mehkema ewlekârî ya dewletê) a Enqerê dawe vekir. Nuha iddianameya di der heqê van kesan de temam bûye û sawciyê bi nav û deng Nusret Demiral di derheqê wan de ceza idamê daxwaz dike. Ev ceza li gor benda 125'an e û li dij kesên ku bixwazin "dewletê perçê bikin" û "xiyaneta bi welêt re" tê bikaranîn. Ev benda qanûnê heta nuha li dij hin kesen PKK'ê hatîbû bikaranîn. Lê

niha dixwazin li dij HEP'ê bi kar bînin. Ji ber ku serokê HEP'ê Ah-û xwe ji vê serêşê xelas bike.

Mūrad Ciwan

**"Kurd, Tirk ferq nake,
em hemû Tirk in"**


rūpel: 4

Cewher Namig Salim:

"Tirsa wan ji prosesa demokrasiya li Kurdistanê ye"

Rüpel: 6-7

dayîn
Lê di qanûnê de xaleke
îstisnayî hatiye danîn ku
vê qanûnê li Tirkiyê û li
Kurdistanê dike wek du
qanûnên cuda û ziddî hev.
Wê ev qanûn li Tirkiyê bê
kêmasî bê tatbiqkirin, lê
ev qanûn wê ji bo Kurda
tiştekî nuh û pozitif neyne,
berevajî di warê siyasi de
rewşa wan xerabtir dike. Bi
kurtayı, bingehekî resmî û
qanûni dide teror û zulm û
zora dewletê ya ku îro li
Kurdistanê dom dike.



Hêza Çakûç û parlamenteleren Kurd

Mudeta hêza çekûç a ku li Tirkîyê ji bo parastina Kurdenî Kurdistana îraqê hatine bicihkirin, di dawiya meha Çileya Pêşin de xelas dibe. Mayin û nemayina vê hêzê li Tirkîyê, bi biryara Meclisa Tirkîyê ve girêdayîye. Meclisa Tirkîyê her seş mehan carekê dicive, biryara bidawianîn an dirêjkirina mude-ta vê hêzê dide. Mesela girêdana mayina vê hêzê bi biryara meclisa Tirkîyê ve û mesela biryardana her şes mehan carekê, xeterek û bendek ciddîye li ser jiyana Kurdenî Kurdistana îraqê. Bidestxistina vê imkanê Tirkîye her gav dikare xwe li ser berpirsyarên Kurdan û li ser xwediyê van hêzê mutefik ferz bike, di mesela pêşeroja Kurdan de şert û daxwazê xwe li ser mutefikan bide qebûlkirin.

Loma jî her dema ku roj ber bi xelasbûna mudeta hêza çekûç tén, li Tirkîyê munaqşeyeka germ dest pê dike, hin kes û hêz derdikevin û şela xwe li diji vê hêzê diyar diken, wê, wek hêzeka emperyalizmê ya dagirker didin xuyakirin. Hin jî raste rast dibêjin ku mayina vê hêzê têkiliyên Tirkîyê bi îraqê re, bi rejîma Saddam re xera diken, firsetê dide Kurdan ku di bin pozê Tirkîyê de dewletek serbixwe ava bikin, îraqê, perçe bikin. Li gor idia wan perçebûna îraqê û avakirina dewleterka serbixwe ya Kurd, di rojîn pêş de wê rê li ber perçebûna Tirkîyê veke û pirsa Kurdan li ser Tirkîyê bike belayek mestir. Hîn jî bo raya giştî ya Tirkan li hemberî vê hêzê çavşor bikin, iddia diken ku Hêza Çakûç li ser çiyan alîkariya PKK ê dike.

Lê eşkere ye ku ev hêz ne alîkariya PKK ê dike ne jî firsetê peyda dike ku li Kurdistana îraqê dewleterka serbixwe ya Kurdan ava bibe û îraq perçe bibe. Tevî vê jî ev hêz dibe sebebê vê yekê ku demeka din jî Kurdenî îraqê ji êrişen ordiya Saddam bêñ parastin, li ser warê xwe bimînîn, şûnwarêñ xwe yên kavilkirî ji nuh ve ava bikin û piçekî bîhna xwe vedin, fîrsenda jîyanê ji xwe re bibînîn. Lewma jî tevî xeter û tehdiت û daxwazê giran ên Tirkan jî dîsa mesela mayina Hêza Çakûç ji bo Kurdan meseleyek heyatî ye, gelek girîng e.

Lê gava em çavê xwe li munaqşen ku li Tirkîyê li ser vê meselê dibin, digerînin, em dibînîn ku gelekan ji me Kurdenî Kurdistana Tirkîyê hay jî vê gîringiyê nînin. Di Meclisa Tirkîyê de Kurd jî hene. Ya herî muhîmtir grûbeka HEP'ê jî di vê Meclisê de ye. Bi êcebek giran em dibînîn ku geleken Kurdan, du-sê kes ne tê de grûba HEP'ê jî li diji mayina vê hêzê ye. Gava Tirk li diji mayina Hêza Çakûç bin meriv tê digihîje ew Tirk in, xwedî li dewlet û miletê xwe dertêñ, hebûn û jîyan û maftîrtina Kurdan ji bo milet û dewleta xwe xeter dibînîn. Lê parlamenteñ Kurda gava li diji mayina vê hêzê derdikevin gelo ew xwedî li ci dertêñ, li ser nav û menfeeta kîjan mîletî dibêjin bila ev hêz ji Tirkîyê derkeve. Ma nayê bîra wan ku du sal berê bi milyonan Kurd di bin êrişâ ordiya Saddam de çawa bi çol û çiyan ketin. Ma nabînîn ku Saddam çawa li Tirkîyê muhawelan dike ku ev hêz rabe û Kurd bêparastin li hember êrişen wî bimînîn. Ma qet damerek Kurdiyê di wan de tune ku rabîn û nîşanî wan bidin ku yên daxwaza rabûna vê hêzê diken, Ecevit e, Erbakan e, Turkeş e, Saddam e û Ereb û Tirkîn din in ku xwîna hemû Kurdan vexwin têr nabin. Ci trajediyeñ mezin e ku HEP'îyê ku xwe ji herkesi bêtir Kurd dibînîn iro bi dijminêñ Kurdan yên herî çavşor re bûne yek, ketine rîzkekê. Sebeb, argument û iddia çidibin bila bibin divê ewqas ji meriv xwe wenda neke, ewqas jî bi qedera miletê xwe nelîze.

Gelî HEP'îyan, bes e li xwe varqîlin, xwe û derûdora xwe, halê miletê xwe yê perişan bibînîn û xwe têxîn nav refîn wê, rîberiyê jê re bikin, xwedî li êş û derdi wî derkevin.

Rêxistina Keskan li Kurdistanê

Rizgar Kêsteyî

Jiyaneku nuh li Kurdistanê dest pê kirîye. Tev çînê gel, ji bo avakirin, xemilandin û pêşve-birina Kurdistana azadkirî û paqîkirina wê ji pîsi û nexweşîyênu dîjiminê dagirker li paş xwe hîştiye, erkek daye ser milê xwe û kar û xebatê xwe pêşve dibin.

Ji bili kar û xebata siyasî, pîşeyî, yên ku berî nuha ji hebûn yekîtiyênu xwendekar û lawan, jînan, hunermendan, zanayêñ dînî, mamosteyan, mafperweran û cot-karan û hwd. Jî li gora qonaxa nuh a xebatê xwe organîze kirine.

Lê ya jî vê jî dîlxweşkirtir ew e ku li gora rewşa nuh a Kurdistana û pêdiviyêñ nîştimanî yên vê qonaxê, çend rîxistinê din li Kurdistanê hatine damezirandin ku pirtir rûyê mirovayefî û aşîtxwazî yê gelê Kurd û hukumeta wî ya federalî ji bo cîhanê dide xuyakirin.

Ev rîxistinê nuh ku pişti azadiya Kurdistana hatine avakirin. Rêxistina Jeologên Kurdistana, Rêxistina Malbatêñ Enfalkirî û Rêxistina Keskan li Kurdistanê.

Li Dime

BEXDAD: Li Iraqê imhakirina gaza xerdelê

Li Iraqê bi biryara NY û di bin çavdêriya pisporê wê de dest bi imhakirina stokêñ gazêñ kîmyayî hat kirin. Li gor agahdarîya pisporê YN, Ron Manley di destê Iraqê de 511 ton gaza xerdelê heye û dest bi imhakirina wê hatiye kirin. Karê imhakirinê li tesîsê Bakûrê rojavayê Bexdayê li El Muthan tê kirin û wê ji salekê dirêjtir bajo; rojê bes di navbera 3-4 tonan dikare bê imhakirin.

BERLÎN: Mehkema Honecker dest pê kir

Di roja 12'ê Çiriya Paşin de li Berlinê mahkemeya serokê kevin û dewleta Almanya Rojava Eric Honecker dest pê kir. Honecker bi iddiaya ku ew bûye sebebê kuştina hin kesen ku xwestine derbasi Berlîna Rojava bibin, tê gunehkar kirin.

Celsa mahkemê ya yekem 20 deqîqan ajot. Honecker di mehke-mê de destê xwe yê çepê bilind kir û işaretä serkeftinê kir û got bi vê mahkemê "kapitalizm di-xwaze sosyalizmê mehkeme bi-ke".

Armanç

Rojname Kurdi ya mehane

Monthly Kurdish Magazine

Redaksiyon:

M. Eli

Zinarê Xamo

Hesen Mizgin

Mîrza Bextiyar

Lewend Fîrat

S. Rêving

M. Lewendî

Redaktör berpirsyar:

M. Eli

Berpirsyarê beşê

Dimîltî: Malmîsanij

Li vir em dixwazin hinekî li ser Rêxistina Keskan Kurdistana (Rêxistina parastina Tebîtê, parastina hawîrdorê) rawestin û li gorzanîna xwe wê bi xwendevanan bidin nasîn.

Ev rîxistin roja 15.12.1991'ê li bajarê Dihokê ji aliye çend rewşenbîrên Kurd ve hatiye damezirandîn.

Herwekî di danezana damezirandinê de hatiye gotin, hizra damezrandina vê rîxistinê ji van egeran hatiye: Bi salan e ku Kurdistan ketiye bin lingê hovtîrîn dagirkeran, di vê dema dirêj a dagirkerinê de, ji qirkirina mirovan û benderuhan (giyandaran) bigre heya bi dar û giya jî hatine imhakirin. Wêrankirina gundan û şewitandin û jinavbirina bi hezaran bax û daristanê rengîn ên Kurdistanê û qirkirina teyr û giyandarê Kurdistanê û pîskirin û kirêtkirina siruştî (tebieta) we-latî me.

Herwisa Rêxistina Keskan Kurdistana di beyana damezirandina xwe de xuya kîriye ku ev rîxistin bi şiklê damezrandin û armancê xwe wek partîyen Ewrûpî ye. Herwisa wan danûstendin bi partîyen kesk ên Ewrûpî re kirine

ku bikaribin fêde ji tecrubeyên wan wergirin. Dîsa grûbek ji Partiya Keskan Almanya jî li ser ga-zîya wan, ji bo piştgirî û alîkariya rîxistinî çûye Kurdistanê.

Herwisa ji aliye gel û hêzên siyâsî yên Kurdistanê ve jî ji bo vê rîxistinê piştgiriyeka germ hat kirin. Bereya Kurdistanê jî li ser qedexekirina kuştina teyr û tilür û heywanan û birfîna duran çend biryar girtin û ev biryar bi rîka her sê kanalê televizyonê û komî-teyên hevpişkîn Bereyê (cepheyê) hatine belavkirin.

Biryar jî bi vî awayê jîrîn in:

1- Birfîna duran qedexeye û her kesî ku vê biryarê ihlal bike cezayê wê 300 dînar in.

2- Kuştin û nêçîra pezkovîyan, kewan û masiyan bi bomb û dinamitan qedexeye û cezayê wê bi vî awayê jîrîn e:

a- Kuştina pezkovî 2.000 dînar.

b- Nêçîra kewan 50 dînar.

c- Girtina masiyan bi bomb û dinamitan 500 dînar.

3- Mafî rîxistinê heye; teyr û tilürêñ hatine girtin kom bike û wan li ciyên siruştî yên wan azad bike.

Li Fransayê panelek li ser rewşa Kurdistanê

Li Fransayê, li bajarê Pont- Audemer roja 27'ê Çiriya Paşin bi inşiyatifa komîta partiya YEKBÜN'ê li ser rewşa Kurdistanê panelek hat amadekirin. Li dor sêsid kesen Frensi û Kurd di panelê de beşdar bûn. Piraniya beşdaran Fransiz bûn.

Panelê, bi axaftina dosta gelê Kurd Monique TUAN dest pê kir. M. TUAN gotarek bi navê "Ez Kurd im û berê jî ez hebûm" pêşkeshî guhdaran kir. Wê di gotara xwe de bi kurtî behsa hebûna gelê Kurd, mafen wî û qetliamîn li dij wî têr kirin, kir û bi tûndî rexne li bêdengîya welatîn din girt. Di dawiya axaftina xwe de pirs kir ku gelê Fransa çawa dikare alîkariya gelê Kurd bike.

Düre Dr. Cemal BUDAK dûr û dirêj li ser dîroka Kurd û Kurdistanê peyivî.

Endamê Komela Diktorê Dinyayê û dostê gelê Kurd Dr. Jean-François de la MONNERAYE jî film û diayêñ ku komela wan dema koça mezin a Kurdenî Kurdistana Başûr di buhara sala 1991'an de kişandibûn, nişan dan. Film û diayan gelek bala guhda-reñ panelê kişand.

Piştî nişandana film û diayê, Dr. Zinar SILIVI bi zimanê Kurdi behsa bûyeren rojane û hovîtiyên li dij gelê Kurd têne kirin kir, gotinên wî ji aliye nûcîgihanê rojnameya "Medya Gunesi", Rojen Xerzi ve bo Frensi hatin wergerandin.

Di dawiya panelê de ji aliye gelek guhda-reñ Frensi hin pirs hatin pirsîn û bersîva pirsan hate dayin. Piraniya pirsan ew bû ku: "Em çawa dikarin alîkari û piştgiriya gelê Kurd bikin da ku ew rojekê zâtür bigîheje heqê xwe".

LONDON: Major di rewşek xerab de ye

Ji roja diyar bû ku Îngilîstanê di dema şerî Iran û Iraqê de malzemîn ku di çekirina çekan de têr bikaranin firotine her du aliyan,

muxalefet û rojname êrişke tund din ser Serokwezîr Major. Major jî ji bona ku xwe biparêze beyanê li ser beyanê dide. Lî dijatiyetîn di navbera beyanê wî de rewşa wî hîn xerabit dike.

Adres :

Box: 152 16
161 15 Bromma

Sweden

Telefon

46-8-803135

Telefax:

46-8-801825

Utgess av:

Kurdiska

Demokratiska

Arbetarunionen

Postgiro: 50 37 99-9

ISSN: 0348 7385

Aboneti

Prenumeration

Abonetîya Salekê

Li Skandinaviya

150 SKR

Maqam

Myndigheter

250 SKR

Li Ewrûpa

50 DM

Li derveyî Ewrûpa

40 \$

Anons/ilan

nîv rûpel/ en halvsidan

2500 SKR

Şeva Şivan hat sabotekirin

Li Berlinê hin aligîrên PKK'ê êrîş birin ser konsera Şivan Perwer. Şivan Perwer bi beyanekê êrîş protesto kir.

Roja 1'ê Çiriya Paşin, komikek ji 30-40 kesî pêkhâtî ku xwe wek aligîrên PKK dan naskirin ser konsera Şivan Perwer de girtin û nehîştin konser biçe serî. Êrîş birin ser Şivan Perwer, hêk û kevir avetinê.

Şivan Perwer ev êrîşa neheq bi beyanekê nivîskî protesto kir. Ew vê êrîşê weha şiro vedike; "Heta iro kolonyalistan stirîna bi Kurd qedexe kiribûn, nuha êrîşkarên bi navê PKK'yî jî wekî wan dikan. Dixwazin bi Kurdî stranê li min qedexe bikin. Eynî van kesan berî nuha jî konserên min sabote kiribûn û jî min re gotibûn ku 'tu dikarî bi Ingilzî yan bi Tirkî stranî bibêjî, lê em destûrê nadîn ku tu bi Kurdî bistî". S. Perwer beyana xwe weha bi dawî tîne; "Ez ne hunermendê grub, alî, yan dezgehekê me, ez hunermendê gelê Kurd im. Ü kes nikare min ji ser riya hunermendiya gelê Kurd bide alî."

Roja 2'yê Çiriya Paşin, li Osnabrücke endamekê KOMKAR'ê Ahmet Ok hat birîndarîn. Li gor belavoka KOMKAR'ê êrîşkar 3 kes bûne û xwe



Şivan Perwer: "Ez ne hunermendê grub, alî, yan dezgehekê me, ez hunermendê gelê Kurd im." (Foto: Armanc)

PKK'yî dane naskirin. Bi muşta û kéra serçav û laşê Ahmet Ok birîn kirine.

KOMKAR'ê ev êrîş protesto kir û di beyana xwe de weha got; "Em careke din bang dîkin ku rayagîşti ya demokratik, welatparêzîn Kurdistanî û aligîrên PKK'ê yê niyetpaqij li hember van êrîşan

dengê xwe bilind bikin, ji bo rewşke ku kîfa dijmin jê re bê û planê xwe bike jiyanâ, peyda nebe divê hasas bin û di vî warî de berpirsyariyên ku dikeve ser milê wan bi cî bînin. Divê hemû hêz û imkanen me li hember dijminê müşterek be".

Bi kurtî meha buhuri

ANKARA: Dewleta Tirk li Kurdistanê lêkolînan çedike

Bi butçeyekî 5 milyarı serokatiya Wezareta İdarî ya Pêşveçûna Herêmî ya Proja Başûrê Rojhîlat (GAP) di nav du salan de wê 20 lêkolînan çêbike. Lêkolîna herî mezin wê tevgera nifûsi (koçkirin yan li devereke bîcîbûn) ya li 8 bajarên Kurdistanê be. Ji bo vê projê butçeycke 1.5 milyarı hâtiye vegetandin. Projên din jî lêkolînê li ser rewşa civakî a Kurdistanê ne. Dewlet di tespîtkirina politika xwe ya êrîşkar û asîmîlasyonîst ya di pêşerojê de, wê ji encamên vê lêkolînê feyde bigre.

ELEZÎZ: Êrîşa faşist û polisan bi hev re

Roja 10'ê Çiriya Paşin, xwendekarîn Universîta Fîratê buhabûn û bêkalîtetîya xwarînê aşxana xwendegîhî protesto kirin û nan nexwarin. Li ser vê tevgera xwendevanan, polisan û faşîstan (aligîrîn kovara *Bizim Ocak*) êrîş birin ser xwendekaran. Di bûyerê de 10 xwendekar birîndar bûn, 50 ji hatin girtin.

ENQERE: Îdareya Awarte 4 mehîn din jî direj bû

Roja 11'ê Çiriya Paşin li meclîsa Tirkîyê rewşa îdareya awarte hat munaqeşekirin. Pişî munaqeşê bi piraniya dengê her du partiyê hukumetê û yê ANAP'ê, li hember 91 dengen bi 294 dengan Îdareya Awarte li Kurdistanê 4 mehîn din hat direjkirin. Wezîrê Hundurkar İsmet Sezgîn di axaftina xwe de got, dibe ku ev cara dawîn be em wexta Îdareya Awarte direj bikin. Li Kurdistanê ji dawiya 1979'an û vir de urfî idare

yani îdareya awarte heye.

DIYARBEKIR: Turgut Atay hat birîndar kirin

Şeva 12'yê Çiriya Paşin dema serokê belediya Diyarbekir, Turgut Atay ji belediyê diçû male, bi rê ve hat gulebarankirin. Di êrîşê de muhafizê wî mir, ew û şofê-rê xwe birîndar bûn. Qatil nehat girtin. PKK'ê berê înakar kir lê paşê got me êrîş biriye ser.

IXDIR: Teror û provakasyonê dewletê

Roja 2'yê Çiriya Paşin li dor 3000 Kurdi li merkeza Ikdirê ciyiyan û êrîşa dewletê ya li Kurdistanâ Başûr protesto kirin. Hêzên dewletê jî êrîş birin ser meşvanan. Meşvanekî bi navê M. Siddîk Çak şêhid ket û 20 kes birîndar bûn. Hêzên dewletê li dor 200 kesî jî girtin. Pişî vê bûyerê bi provakasyonê dewletê Turkmen û Kurd bi hev ketin û li dor hefteyeke êrîşen faşîsten Turkmen li ser xelkê bajêr dom kirin.

Herweha li der û dora vê herêmî di navbera hêzên dewletê û gerîlayen PKK'ê de şerîn giran çebûn. Derheqê zaîyatên herdu aliyan de beyanên li dijî hev hatin dayin.

BATMAN: Bajarê bê rojname

Di destpêka vê mehî de li ser hin tehdîdan, bayîye giştî yê belavkirina rojnaman istifa kir. Li ser vê yekê 13 rojan li ser hev tu rojname li Batmanê nehatin firotin. Di gel temînatê waliyê Batmanê Zekî Şanal heta nuha tu kes ji vî karî re nebû talib. Heta kesek ji vî karî re bête dîtin, wê polîs ji kantîna xwe rojnaman li

bayîyan belav bikin.

ANKARA: Parlamentenê HEP'ê 8 rojan nan newarin

Roja 10'ê Çiriya Paşin 18 parlamentenê HEP'ê ketin grawa nannexwarin. Grewê 8 rojan dom kir. Roja 8'an dest ji grawa xwe berdan. Serokê HEP'ê Ahmet Turk di ciwîna çapemeniyê de got "em gîhîştin armanca xwe". Armanc ew bû ku bala parlamento û raya giştî bikşînîn ser zulum û şîdetâ ku li Kurdistanê dom dike.

ELEZÎZ: Grawa birçibûnê di roja 50'yî de encam da

Li girtîgeha Elezîz 261 girtîgen siyasi ji bo bidestxistina mafîn xwe yên însanî 50 rojan bi dorê ketin grawa birçibûn. Heta nuha gelek caran nûneren girtîyan û berpirsiyaren girtîgehî hatin cem hev, lê li hev nekîrin. Cara dawî roja 17'yê Çiriya Paşin, nûneren girtîyan, berpirsiyaren girtîgehî û rêveberen Komela Mafîn Mirovi şûba Diyarbekirê li hev ciyiyan û li ser peymanekê li hev kirin û girtîyan dest ji grawa birçibûn berdan. Li gor peymanê; ew eşyayen girtîyan ku idara girtîgehî dest danibûn ser, wê li wan bêne vegerandin û zerara wan wê bê dayin; qedexekirina ziaretê wê ji nuh ve bê tesîskirin; peya û jin ji bo amadekirina parastina xwe ya mehkemê dema bixwazin wê bikarîbin bêne ba hev; tup û ocaxen elektrîkê wê li qawuşan bêne belavkirin; daktilo, teyib, peyivandina bi telefonê wê serbest be; eşyayen kantînê wê bi fiyeteke maqûl bêne firotin.

NEYNIK

Federasyon Serbilindiya Kurdan e.

Mîrza Bextiyar

Federasyona Komelê Kurdistanê li Swêdê ji bo Kurdan bûye mînakek baş. Dema qala dezgeyên netewi tê kirin, feyde, rîndî û lazimiya wan tê rîzkirin, tavîlê mînaka Federasyonê tê dayîn.

Dema em Kurdên Swêdê dertêne derveyi Swêdê, bi Kurdêne wela-tê Ewrûpa yên din re an jî li Kurdistanê sohbetê dîkin, pirs tê ser Kurdêne li Swêdê; li Swêdê Kurd ci dîkin? Wek em bi dilxwazî li hêviya pirseke weha bin, bi serbilindî qala yekîtiya Kurdan ya li Swêdê dîkin, qala sîstema Federasyonê, xweşî, kar û qazanca wê ya ji bo gelê Kurd dîkin. Ez yên din nizanim, lê ez weha me. Ez bawer im hevalê din jî wê weha bin, çunki hezkirin û memnu-niyeta wan a ji Federasyonê re di çav û refleksen wan de xwiya ye.

Em ne neheq in jî. Federasyon muesesa yekta ya Kurdan e ku ji herçar perçen Kurdistanê, Kurd li ser esasekî demokratik li dor xwe civandine. Bi 40 komelêne xwe yên endam, bi sekisiyona xor-tan û jinan, bi komelêne xwe yên pişeyî wek; doktor, huqûqnas, mamoste, nivîskar û hwd, bi komîten xwe yên wek "Piştgîriya Girtîyan" di warê xwe de di hemû dîroka Kurdan de bê emsal e. Rêxistîneke demokratik e, lê karê siyasi jî dike, bi karê civakî radibe, lê ne tenê rêxistîneke civaki ye. Federasyona Komelê Kurdistan li Swêdê ne tenê bi temsîla Kurdan li Swêdê tê naskirin. Par bi tevgera xwe ya li dijî nijadperestiyê, bi qarardarî û pêşniyarek xwe yên maqûl derket pêş. Federasyon iro li Swêdê, yek ji rêxistînê herî bi itîbar, xurt û pêbawer e.

Bi hatina wefda parlamento ya netewi a gelê Kurdistana Başûr, Federasyon bi erkeke nuh rabû; konsolosî. Bi hazırlîyên xwe yên berî hatina wefdê û di wan heft rojê ku wefd li Swêdê bû, Federasyonê, di organîzatoriya xwe de ji konsolosxaneyekê ne kêmîtir serkefti bû.

Federasyonê programa wefdê Federasyonê amade nekir, lê bi pêşniyarek xwe dewlemendir kir. Lî ya herî girîng pir ciddî program da meşandin. Derveyi beşdarbûna wefdê di ciwîna Komîta Gişî de, Federasyon bi amadekirina şîvekê li dor sed siyasetmedar, nivîskar, rojnamevan û şexsiyeten Kurd û wefda parlamento ya netewi anîn ba hev. Bi amadekirina ciwîneke fireh firset da nêzî hezar Kurdî ku ew ji devê serokê Parlamento Netewi rewşa dawî ya Kurdistanâ azad, nakokiya di navbera hukumeta Kurdistanî û PKK'ê de bibihîzin; pirs, hêvî û şikîn xwe di şexsiyeta wefdê de bîghîjînin parlamento Kurdistana. Wefda parlamento û rîxistînê Kurdan di şexsê wê de wek numûna yekîtiya tev Kurdan dida wan.

Nûneren wefda Kurd berî ku werin Swêdê çübûn Almanyayê û İswîçreyê. Lî ji organîze û ji hazırlîyek bi vî rengî bi rîk û pêk re nebûn şahid. Ji ber vê yekê di her wesîlê de serokê wefdê, Namiq Cewher sipasiya Federasyonê dikir. Û di her firsetê de girîgiya hebûna Federasyonê û rîxistîbûna Kurdan di şexsê wê de wek numûna yekîtiya tev Kurdan dida wan.

Ez wek Kurdeki gelek dilşad im ku em xwedîyên mueseseke bi vî rengî ne. Ez bi endambûna xwe ya komeleke Federasyonê serbi-lind û dilrehet im. Spas ji Federasyonê re!

★ ★ ★

Roja 22'yê mehî kongra Komela Kurd li Stockholmê çübûn. Ez gelek êşiyam. Li gor nifûsa Kurdan li Stockholmê, li gor hizkir, dilxwaz heta endamên komelê, hejmara beşdarêne kongrê û endamên ku endametiya xwe dabûn gelek kêm bûn. Ji siyasetmedar, hunermend, şexsiyeten li belediya Stockholmê rûdinên û ku Federasyon tu car wan ji bîr nake û qîmetek bilind dide wan, çi bigre kes di salona kongrê de tunebû. Gelo em bi karên gelek girîng mijûl dibin ku salê carekê-du caran wextê nabînin, bidin tiştên weha "piçûk"?

Ji aliyê din mixabin, çavên min bi tu Kurdêne me yên Kurdistanâ Iraqê û Iranê neketin.

Divê neyê ji bîr kirin Federasyon ji komelan pêk tê. Xurtbûna komelêne endam wê Federasyonê xurttir bike û wê riya karên hîn bi rûmettir veke.

Divê em qîmeta Federasyonê bizanin.

RAMANÊN RAMANWERAN

"Kurd, Tirk ferq nake, em hemû Tirk in" (!)

Mûrad Ciwan

Gava peyv tê ser peyvê, berpirsiyaren dewleta Tirk û avakirên raya giştî ya Tirkan dibêjin ku li Tirkîye ferq di navbera Kurd û Tirkan de nîne, hemû hemwelatiyên hev in û bi qasî hev xwediyên vî welatîne. Ew, vê zilm û zora ku bi salan e li Kurdan dibe jî wek neheqiyek ku li birayekî bibe, nişan didin. Heta salek berê, di rojên pêş û piştî avabûna hukûmeta iroyîn de, li ser qebûl-kirina hebûna Kurdan bi awa-yekî resmî û dayina mafêwan û siyasi û kulturi beyanên resmî derketin û gelek tişt hatin nivîsin. Serokê cumhûriyeta Tirkîye Turgut Ozal got ku divê meriv karibe mesela federasyonê bi xwe jî munâqeşe bike.

Biratiya gotinên vala

Beyan û nivîsên wiha li derive û li hundirê welêt he-wayek hêvîbexş û dilaram peyda kir. Ji wê demê heta îro, kêm-zêde salek derbas bû. Îro jî li ser hebûna Kurdan û pirsa maf û azadiyên wan gelek beyan têni dayin û tişt têni nivîsin. Lé gava meriv van dide ber yêni berî salekê, tê dîtin ku Tirkîye di pirsa Kurdi de çend durû û sextekar e û Tirk li hember Kurdan çend bêbext û neyar in. Ji roja ku ordiya Tirk li ser hudûdê Kurdistana Tirkîye û ya Iraqê dest bi operasyonê berfireh kirin, zimanê Tirkan, bi berpirsiyaren xwe yên resmî û yên siyasi û rojnamevan û nivîskaren xwe ve bi carekê de hatiye guhertin. Êdî behsa biratiya Kurd û Tirkan, hemwelatiyâwan nayê kirin. Behs behsa şerê ordî û miletê wan li hember hêz û miletê dijmin e. Di êrisen li hember PKK'ê de, rojname bi manşetên mezin xwiya dikan ku çawa "dor hatiye ser Mehmetçik" û çawa ordî dol bi dol, şax bi şax mewzî û çeperan bi dest dixin û ala Tirkan li ser lütikên şaxan dadiçikînin. Çawa bi mîranî êris dikan, "terorîstan" dikujin û çawa bi mîrxaşî şehîd dîbin. Manşetên wê yekê derdixin ku şehîdên wan ên esker û polis bi ci merasim û meşen girseyî têni hilanîn û milet bi kîn û nefretek li hember PKK'ê û Kurdan û bi dilovanî bi hezkirin û serbilindiyek mezin li hemberî şehîdên xwe radibin ser piyan, xwedî li şehîdên xwe dertê. Rismen şehîdên wan yên dê û bav, jîn û zarokên çav bi hêsis, xemgîn lê serbilind rûpelêن

Tirk ne amade ne û ne jî dil û mîjiyê wan ji wê yekê re ne vekirî ye ku rastiya Kurdan gebûl bikin, heq û hiqûqê Kurdan teslim bikin, bi çavê birayekî wekhev û hemwelatiyekî xwendan mafê wekhev li Kurdan binêrin. A xerab, siyasi, ronakbir û rîberên Tirkan yêni ku civakîn Tirk li dora xwe civandine jî jî dêvla ku vê şuûra hov qels bixinin ew bi xwe wê tûj û pîjtir dîkin. Nexwe, divê em zanibin ku gava peyv tê ser peyvê û ew behsa biratiya Kurd û Tirkan dîkin, cardin qesta wan ew çiroka berê ye ya ku her gav, li her derê derdiket pêşberî me: "Kurd, Tirk ferq nake, em hemû Tirk in û di bin ala Tirkîye de dijîn".

rojnaman û ekranên televizyonan dadigrin. Ji bo gaziyyen xwe û malbatên şehîdan kampanyayen alîkariyê vedikin û li derve û li hundirê welêt peran kom dîkin. Gava di vê kampan-yê û di vê propagandayê de pêşde diçin, çavşor û hartir dîbin, kefa ser devê wan pêl bi pêl hil dibe, ji ruh û şuûra insaniyetiyê tu tişt bi wan re namîne. Ji bîr dîkin ku ew şehîd û gaziyyen wan di dema êrîşek wiha de hatine kuştin ku hucûmî ser gund û bajarê "hemwelatî" û "birayê" wan ên Kurd dîkin. Gund û bajar xera dîkin agir bera mala insanên sivil ên bê çek û bê parastin didan. Bi hezaran û bi deh hezaran insan ji ber hicûma wan a dirindane, cî û warênen xwe bi cîh dihiştin û bi çolan dîketin.

Yên wan "şehîd" yêni me xayîn û terorîst in

Qet behsa wê yekê nakin ku di vê êrisa bi tank û top û teyaran de bi dehan û sedan xort û keçen nûgihayî têni kuştin. Ji bîr dîkin ku heta niha ordî û polisên wan sê-çar qat zedetir keç û xorten sivil kuştine. Ji bîr dîkin ku dê û bav û bira û xwiş yan jî jin û mîrên van kuştian hene û ew jî li vî welatî dijîn; hejmara wan diğihîje bi milyonan insan. Ji bîr dîkin ku li vî welatî ji 15 milyonan zedetir Kurd hene, ji ber vê kuştin û talan, warwêranî û barkirê perîşan in, agir bi kezeba wan ketiye. Naxîn hesêb, yan jî bo wan qet ne xem e ku ev nifusa bi milyonan li televizyona wan temaşe dike, guh dide beyanên wan û nivîsen wan dixwîne. Ji bo ku ew ji insaniyeta xwe dûr ketine nikarin bi çavekî insanî li vî nifusa 15 milyonî jî binêrin, têxîn bîra xwe ku ew jî insan in, hissîn wan jî, şeref û heysiyet û namusa wan jî heye. Na ew vê nifusê, çiya û warê wê, keç û lawîn wê bi tiştekî hesab na-

kin. Li gor wan yêni ku hatine kuştin, terorîst in, xayînê welêt in, musteheqî kuştinê ne. Dê û bavê wan, heval û hogir û nasîn wan jî, nezan û bêfam û paşdemayî ne, wek heywanan in, loma ne hêjayî wê yekê ne, ku meriv wan bi bîr bîne, behsa hîssîn wan bike. A bîr û bawerî û naskîrin û teqdîr-kirina berpirsiyâr û ronakbirê Tirkan di derheqê me Kurdan de ev e.

Divê em tûkin ser çavê wê

Gava rastî ev be, çetir xwiya dibe ku di mesela jiyan Kurdu Tirkan ya bi hev re, bi awayekî birati û wekhevî de Tirk hê li ser mejjî û şuûra xwe ya berê, ya dewra Kemalîzmê mane. Bi peyvan ci dibêjin bila bibêjin, gava dor tê ser rastîyê, rûçikê wan ê kevnare, yê qirêj derdikeve meydanê, hovîti û bêpariya ji merovatiyê, bi her awayî xwe derdixe holê.

Tirk ne amade ne û ne jî dil û mîjiyê wan ji wê yekê re ne vekirî ye ku rastiya Kurdan gebûl bikin, heq û hiqûqê Kurdan teslim bikin, bi çavê birayekî wekhev û hemwelatiyekî xwendan mafê wekhev li Kurdan binêrin. A xerab, siyasi, ronakbir û rîberên Tirkan yêni ku civakîn Tirk li dora xwe civandine jî jî dêvla ku vê şuûra hov qels bixinin ew bi xwe wê tûj û pîjtir dîkin.

Nexwe, divê em zanibin ku gava peyv tê ser peyvê û ew behsa biratiya Kurdu Tirkan dîkin, cardin qesta wan ew çiroka berê ye ya ku her gav, li her derê derdiket pêşberî me: "Kurd, Tirk ferq nake, em hemû Tirk in û di bin ala Tirkîye de dijîn".

Gava rewş ev be ji bo wan çareyek dimîne, her cara ku ev çirok derket pêşberî me divê em tû kin ser çavê wê û bi riya xwe de bimeşin.

Zinarê Xamo*

Mezinên mezin nabin

Di jiyana insan de jî wek mewsimen salê hin mewsim, hin qonax hene. Her qonaxek bi xweşî û bi t'aliya xwe ve divê di wexta xwe de bê jiyn. Wek J. J. Rousseau (Rûso) jî gotiye, "Her saleke jinê li gor xwe hin qaide, hin wezîfe û hin faziletên xwe hene".

Yanî bi kurtî, gava meriv zarok e divê wek "zarokekî" bijî, gava xort e divê wek xorkeki û gava mezin e jî divê meriv bi her awayê xwe wek mezina be.

Herkes kal û pir dibe, lê herkes mezin, bîrewer nabe. Gelek insan hene, bi rabûn û rûniştina xwe, bi aqil û idraka xwe heta mirinê ji tim zarok dimin; tu carî şexsiyeta insanekî mezin nagrin.

Em dizanin yê şikil dide qerekter û şexsiyeta insan şertên sosyal in. Ew kesê ku piştî xortaniya xwe di nav şert û têkiliyên ku insanekî kamil dike, dike "rîsipî" de nejî, ew kal jî bibe, por jî bike hiri cardin nikane xwe ji psikolojiya zarokiyê, xortaniyê xelas bike.

Roj tuneye ku ez bi xwe rastî kesen wiha neyem, di rojnaman de nivîsên wan nebînim, di civatan de li wan guhdarî nekim. Xasima jî li dervayî welêt kesen wiha roj bi roj zêde dîbin. Çimki ew ji civata xwe bi dûr ketine, ji wan şert û têkiliyên kulturî û sosyal bê par mane.

Gava em derketin derveyî welêt piraniya me salen wan di navbera 25 û 30'i de bû. Di ser wê rojê re 12 sal derbas bûn. Ji me gelekan wa ye ji zûde ye por sipî kirine, bûne xwedî nevi.

Îcar bifikire mirovîku salen wî gîhiştiye 40-45'an lê hîn kesî carê jê re negotiye "xalo", ya jî "apo" (Çimki xorten li vir mezin dîbin ji mezinên xwe re nabêjin **apo** ya jî **xalo**, bi navê meriv ban meriv dîkin).

Hîn eydiyekî xwarziyekî wî, biraziyekî wî, destê wi maç nekiriye û eydaniya xwe jê negirtiye.

Hîn li kuçakê du zarok ji hev neqetandine û wek mezinîki bi wan de nexeyidiye. Yanî kîf, awantaj, heq û huqûqê "meziniya" xwe, nejiyaye.

Hîn li çayxaneyekî xortek ji ber ranebûye û kur-siya xwe nedayê...

Hîn rojekî ji rojan ne çar xort li dorê rûniştine, lê guhdarî kirine û ne jî ew li cim'etekî li ba du rûsiyiya rûniştîye, guhê xwe daye tecrübe û serpêhatiyên wan.

Îcar yekî ku buhara jiyan xwe di nav van şertan de bibuhurine ma wê çawa kanibe recutiya rîsîtiyê ji xwe bike?

Yê meriv dike "insan" civat e. Îcar em jî ji civata xwe bi dûr ketine û neketine nav civata em di nav de dijîn jî. Lema jî em ne dişibin Kurdan û ne jî Swêdiyan...

Axir vê Ewrûpa kambax ne tenê zarokên me ji dest me birin, her wisa nehişt ku **mezinên** me jî xwe ji ruhê zaroktî û cahiliyê xelas bikin.

* Ji ber ku min bi navê "Zinarê Xamo" di quncikê "Hindîk û Rîndîk" de dînîvisand, nedîbû ku di vir de jî ez bi wî navî bînîvisîntim, lê ji demekê vir de ye, ew quncik tuneye, lema jî edî mechûrîtyeta navê "Lawîkê Berrîvanî" ji ortê rabûye. Ji iro pê ve, ezê bi navê xwe yê nas bînîvisinim.

Li Kurdistana Iraqê du buroyê Amerîkayîyan

Li gor nûçeya Kamûran Qeredaxî ku di rojnama El Heyat de derket, Amerîkayê biryar daye ku li Kurdistana Iraqê, li bajarê Hewlêr û Silêmaniye du buroyan veke. Ev herdu buro wê bi Wezareta Derve, beşê mirovî ya Amerîkayê ve girêdayî be.

Dîsa li gor hin çavkaniyê Kurd ên pêbawer ku ji rojnama Heyat re hatiye gotin; Amerîkayê wê bi wasita van herdu buroyen xwe, pêwendî bi hukumeta Kurdistanê re deyin. Bêguman ev pêwendî wê li ser têkiliyên alîkariya insanî ne.

Li ser vê yekê jî, di 30.11.1992'an de mesûlê yekemîn ê koordinasyona eskerî ya muttefikan, Robert Young û nûnerên wezareta derve ya Dewleta Amerîkayê li gel Celal Talebanî, Mesûd Barzanî û giregîren hukumeta Kurdistanê li bajare Selehdîn civînek çêkirin.

Karê van herdu buroyan yê sereke ew e ku alîkariya Amerika dişine, bi awayekî rîk û pêk li gel Hukumeta Kurdistanê li xelkê belav bikin. Li gor nûçeya K. Qeredaxî, welê diyar e ku Amerîka di programa xwe ya ji bo alîkariya Kurdan de gelek bi israr e.

Gerrek dîrokî li nav arşîvan

Celîl Celîl



Ked û Sikirdarî

-3-

Ji roja mirina Î. Marogûlov û bi vir de dora 60 salan derbas bûne. Kirinê wî yên xêrxwaziyê û rewşenbirîya bona pêşveçûna çanda Kurdi hîn bi hêjau nehatine nûrx kirinê. Heyf, hin nivîskar kirinê wî, bi taybeû avakirina elîfba Lañî salen 60'î destpêkin bê bingeh bi navê rewşenbir, nivîskarê Kurd ê bi navûdeng Erebê Şemo ra (Şemîlovra) gîrê didin. Kirinê Erebê Şemo li meydana lîteratûrayê, çand û jiyana Kurdan ya nûsosyalistîyê da bi xwe serbilindîya Kurden Sovyetê û ne û hewce ye tişte nekîn bi navê wî va girêdin. Ev yek nek navê wî mezin dike, lê belê siyê davêye ser navê wî, dudîfîyê li hemberî navê wî pêşda tîne.

Dîrok li ser faktan tê nivîsarê. Faktên dîrokê sedan sal derbas dibin, lê rengê xwe na-guhêzin. Faktên ser xudanê avakirê elîfba Kurdi ya Lañî bi dehan mane.. Rojnamen salen 20-30'î rastîye didin xuyakirin. Rojnamegerê Rojnama Ermeniyâ ya bi xuya "Xorhîdayn Hayastan" pişî naskirina elîfba Lañî ji aliye dewletê hevpeyvîneke dûr û dirêj bi Î. Marogûlov re weşand û di gotara xwe da di-nivîsê, ku ev hevpeyvîn ewî tevi Xudanê elîfba'yê Î. Marogûlov kiriye.

Bona rastiya dîrokê em bêjin, wekî rola Erebê Şemo bona ku elîfba Kurdi bê pê-kanînê, bona ku ew pirs ber dewletê bi aktualî bê danînê, hebûye. Û nek tenê Erebê Şemo, lê tevî wî zimanzanê Ermenî, rewşenbirê Kurden nûbişkîvî ji xizmeta xwe ya hêja di vê pîrsê da kire.

Rastiya em wenda nekin, Xudanê elîfba Kurdi ya Lañî bona Kurden Sovyetê Î. Marogûlov bûye. Ji me ra nav û namûs e em kirinê merivekî dilsoz, wekî bi eslê xwe ne Kurd bûye, Asûrî bûye, lê bi evîneke mezin ji gelê me ra xizmet kiriye, em ji bîr nekin ú şekirdariya xwe li hemberî kirinê wî û navê wî bi serbilindî bêjin.

Li jêr em du dokumentan rabiî xwendanen "Armanc"ê dikin. Yek gotar-bîrânîa berpirsyarê rojnama "Riya Teze" Cerdoyê Gêncô ye, ku wî sala 1933'a li ser Î. Marogûlov nivîsiye. Ev gotar baştırin iżbatıya wê yekê ye, ku çawa Î. Marogûlov hê ji sala 1925'a li ser avakirina elîfba Kurdi kar dikir û pê dîşewîti, wekî bîrc serî. Ya du-dan, ew nama Î. Marogûlov e ku wî sala 1929'a ji Casimê Celîl ra nivîsiye. Sala 1929'a gava Elîfba Kurdi bi dewletî hate nas-kirinê, Casimê Celîl li bajarê Bakuyê li mekteba eskerîye dixwend, ew namekê ji Xudanê Elîfba ra dinivise ku Kurd çawa spasdariya xwe jê ra diyar dikin. Di bersîva Î. Marogûlov da dilovanîya wî li hemberî gelê Kurd bi başî diyar dibe.

1. Gotar-bîrânîa Cerdoyê Gêncô "Bi dil û can dixebeitî seva kultura xevatçiyê Kurmanca"


Min Îsaak Marogûlov sala 1925'ê li nehya Axbaranê, di hemcivata xebaikaran Kurmanca da nas kir. Ew ji Rewanê wek delege hatibû. Berî destpêkirina hemcivatê em çend aktivîyen Kurmanca li dora Îsaak Marogûlov civîyan, me tewaqe jê kir, ji bo ku ji me ra dereca elîfba Kurmanci ya teze şirove ke. Berê ji me bîhîstibû, wekî menîkî usa li ser Elîfba me ya teze dixebeit, lê me

ne ew dîbû, ne jî xebata wî. Îsaak Marogûlov guleş bû, eşqa dilê wî hîn gur bû, gava dît ku em çend cahil bi dilekî xemdarêne elîfba teze ne.

Em li kîleka gund, li cîkî hêşinayî li dora Îsaak Marogûlov rûniştibûn, wî berê ewlin nasiya xwe da me, wekî 30 sal e, ew seva mîaserkirina elîfba Kurmanciye dixe-bit, lê jê re mîaser nebûye, û kesî guhdariya wî nekîriye, ne jî hesab ji Kurmanca ra ki-neye.

Îsaak Marogûlov ji çîntê xwe çend tîrakê* mezin û şikîlî elîfba teze derxist li ber me danî: -Pêşkêşî we, gelî xorten cahil, hûn dinêrin min elîfba teze bi saya firqa komunîstî û Diwana Şêwîr hazir kiriye, rî li pêşya we cahil û xebatçiyê kurmanca ûrî gelelek fire vebûye. Em zûr bûbûn, me li çavê wî dînihîrîn, wexta wî ji wan tîrakâ mezin

Y. Marogulov. R. Drambjan.



ji yekê çend belg xwendin bi zimanê Kurmanci, çawa nanga bi zimanê me elîfba hazir e, deqekî me xwe ji şabûna şas kir û em bê hemdi xwe bi hev ra rabûn ji rî û cara din rûniştin, me ji şabûna nizanibû ci bêjin.

Em weke du sehetâ li wî erdi rûniştin, li dora me civîyan gelek dîlegatî hemcivatê, berê gişkayî li xeberdana Îsaak Marogûlov bû. Îsaak Marogûlov li ber çavê me, me gelêkî dixwest guhdariya xeberdana wî bikira, lê wext tunebû, dest bi civatê dibû. Em wê da lîviyan.

Çend sal ji wê rojê derbaz bûn, em tim li hev diqesidin, elîfba yekê Îsaak Marogûlov çêkir Firqa Komunîsta û diwana Şêwîr rast rî kir, bi çend deh hezaran mesref lê kir. Nesîr bû kitêba Marogûlova ewlin "Xo-xo hînbûn" bi zimanê Kurmanci, dest bi xebata mektebî xebatçiyê Kurmanca bû, diha gumreh Marogûlov tevî her xebatê bû, şev û ro dixebeitî seva kultura xebatçiyê Kurmanca, jê tîr nedibû, ji tu civata sînda nedima.

Sala 1929-1930'î li bajarê Rewanê kur-sa seydayê Kurmanca ewlin vebû, li kederê Marogûlov seyya bû, hebûn seydane mayîn ji ji dersa sîn da te rûyê wan nedîf, lê Î. Marogûlov her tim, rojê gelek car êvara heta nîvê şevê di va kûrsatî da ders didan hînkirinê, ji kûrsanta hîltanî dinivisi beyt û kilama xevatçiya, dinivisi şevo û ser hevda lod dikir, ew bû rehetiya Î. Marogûlov, timê ew.

Xevata Î. Marogûlov 30 salî bi saya Ingilaba Oktyabrî, bi saya firqa Komunîsta nola çîrak nav xevatçiyê Kurmanca da per-lemîş bû, vêket.

Îro ji me qetiya xevatçiyê delal, hîmdarê

kultura xevatçiyê Kurmanca Î. Marogûlov. Ew li pey xwe hiş rû dînyayê xevata sérîn û qîmetî. Navê Î. Marogûlov, xevat û kirina wî car nayê bir kirin di nav xevatçiyê Kurmanca da. Li her ciya em iro ji dilê hezar-hezar xevatçiyê Kurmanca rehîtiye didin hestîye Îsaak Marogûlov.

Cerdo

"Riya Teze, sala 1933, 15 İlonê, N 42 (129).

2. Nema Îsaak Marogûlov ya 08. 12. 1929 ji Casimê Celîl ra nivîsî

Heval Casimê Berêz!

Îro 8'î Kanûna pêş nama we gîhişte min û dilezinîm bersîva we bidim. Berî pêş deynê xwe dibînim ji we ra bêjim, wekî nama we dilê min hingavt. Gava min ew name stand, tê bêjî him qewet û him hereketê min bona karên nû ji bona xizmeta gelê Kurdî bi siyaset û şîmpâtî zêde bûn.

Hûn, Casimê eziż, kîrinê min zêde mezin dîkin û hin zêde ji pesnê min didin, gava ji min ra divîn profesor. Ez dersdar im çawa gelêk in û ne zêde. Lê belê, şekirdariya we dilê min kir baristan û ew li ser min kir bargiranî, wekî ez hemû qewata xwe, hemû taqeta xwe bi gişî amadeyî karê ronakdariya Kurden ta-riyê da mayî bikim.

Bi dîlkîşî hêviya we ya li ser kar û kîrê me bi ci tînim.

Xen ji pirtûka bi serê xwe hînbûna zîma-nê Kurdi, cem me usa ji çap dibin: Pirtûka para pêşîn bona girûba pêşîn ya ku wê van rojan ji bin çapê derkeve û para duduyan bona grûba duduyan. Ew ji wê pişî wê pîrtûkê derkeve.

Hema ew pirtûka çap bibin, ezê dest-xwe da ji te ra rîkîm.

Xen ji van pîrtûkê dersan, li bal me 16 pîrtûkê ji bona xwendîna zarokan li ser çapê.

Çapkirina van pîrtûkê biçûk hertenê ji tunebûna kaxiz derengî dikeve.

Bi vê yekê dawîya xebata me nayê, bername me ya çapê mezin e, îfi serhev de tînîn pîrtûkê dersxana grûbîn 3 û 4'a bona dibista-nen dereca pêşîn, pîrtûkî politîkî, pîrtûkî ser malhebûna gunditîyê û yên mayîn. Pişî wê emê berhemekî taybetî ya stranê gelê Kurd ên çîrok û tîşen dinê amadeyî çapê bi-kin.

15'î Kanûna Pêşîn ya îsal li bajarê Yêr-vanê bona tîvdîra dersdarîn Kurd qûrsen hîştî.

Ji me ra wê bîve şabûn pevgirêdana xwe bi we ra dom kim û bi soz bersîva hemû na-mîn te ezê bişînim. Her tenê kêmâni ji min ra nebîne, wekî ez bi zimanê Rûsî ji te ra di-nîsim, xwendîna min a zimanê Ermenî tûne.

Îcar em bêne ser daxwaza we ya paşîn, ser wêneyen min. Ez bêjim, bi rastî ez ne meri-vekî waha xuya me, ku wêneyen min oda we da rewseke hêja, lê herwa, ezê ber xwe bidim nava rojîn nêzîk de ji we ra bo yadigarî wê-neyê xwe bişînim. Hêviya min heye: heger li Azerbeycanê nasen we yên Kurd hene, elîfba me di nav wan da bidin belavkirinê.

Bi minetdariya dilê sax, dimînim qedirigî we

Î. Marogûlov

8.12.1929

Êrivan


Birîvîsin hema ser wê adresê

(Kopya namê li arşîva mala Casimê Celîl da tê parastînê)

Parlamente Asûrî Fransîs Yûsif S'abo:

"Em bi hev re bûne armancê êrişan"

Fransîs Yûsif S'abo Asûrî ye. Ew ji listeya Tevgera Demokratik a Asûrî di hilbijartina 19'ê Gulana 1992' an de ji bo endametiya Meclisa Netewî a Kurdistanê hatiye hilbijartin. Û yek ji endamên delegasyona Meclisî ye ku hatiye Ewrûpayê. Heval S. Rêving ji bo xwen-devanen Armancê bi Fransîs Yûsif S'abo re peyivî.



Fransîs Yûsif S'abo

li me vegevîne. Ne problem e ji. Madem demokrasi li Kurdistanê heye, wê herkes mafîn xwe bi dest bixe.

Armanc: Hêja Frencîs Yûsif S'abo, tu endamê meclisa Kurdistanê yî û tu Asûrî yî. Di destpêka sohbeta xwe de em dixwazin bizanîn, li Kurdistanê Iraçê û Iraçê hejmara Asûrîyan çend e?

F. Yûsif: Dema di 19'ê Gulana 1992'an de li Kurdistanê Iraçê hilbijartin çebûn, hejmara Asûrîyan teqrîben 150.000 bû. Û li gor hejmarta gişî ya sala 1987'an li se-ranseri Iraçê 1.200.000 Asûrî hene. Berî niha piraniya wan li devera Mûsilî û li Kurdistanê dijîyan. Dema rejîma Iraçê dest bi wêrankirina gundan kir, gelek Asûrî çûn bajarên mezin wek: Mûsil û Bexda, lê piraniya wan çûn welatîn din. Niha li derveyî Iraçê nêzî 1.500.000 Asûrî hene.

Armanc: Asûrîyan li Kurdistanê li kijan deveran dijîn?

F. Yûsif: Piraniya wan li devera Dihokê û Hewlêrê xwecîn in. Li hemû Kurdistanê Iraçê 183 gundan Asûrîyan hene ku hemû jî ji aliye Seddam ve hatine hilweşandin.

Armanc: Bi tenê Asûrî li van 183 gundan dijîyan?

F. Yûsif: Belê, bi tenê Asûrî. Lê mixabin rejîma Seddam bi xanî, mekteb û dîrênen wan ve -ku hînek ji van dîrênan berî niha bi 1500, 500 salan hatibûn avakirin- tev xirab kirin. Her weha Asûrî li bajarê 'Eynkawa, Şeqlawa, Diyana û Koysincâq ji pir in. Li Silêmanîyê ji nêzî 120 malbatîn Asûrî hene. Lê piraniya nufûsa me li Behdînan xwecîh.

Armanc: Tu wek parlamente di du komisyonen parlamento Kurdistanê de cih dîgrî. Komisyona Avakirina Kurdistanê û Komisyona Aborî. Di warê avakirina Kurdistanê de problemen we yên mezin ci ne?

F. Yûsif: Problema herî mezin têkçûna aboriya Kurdistanê ye. Pere û îmkaniyetîn me tunene ku em bikarin gund û bajarên xwe ji nû ve ava bikin. 4500 gund hatine xirab kirin. Alîkariya ji me re tê pir kêm e. Problemeke din ya mezin mayîn in ku hukûmeta Iraçê li seranseri sînorê Kurdistanê û li dorûberê gundan mayîn kiribûn. Heta iro gelek gundi û zarokan wan ji ber van mayînan mirin û gundi nikarin biçin ser gundi û Gundan xwe, heta ev mayîn neyî rakirin.

Armanc: Wek Komisyona Avakirina ma heti niha we tişte nekîriye?

F. Yûsif: Tu dizanî hem parlamento, hem hukûmet nû ne. Li Kurdistanê çend rîexistinê din hebûn ku ji hev cuda bi avakirina Kurdistanê bili di-bin. Projeyen wan hene, têkîlyen wan bi rîexistinê insanî re hene, hetta alîkariye ji digrin. Baweriya Komisyona me ew e ku çêtir e ev rîexistin û komîte hemû bigîhin hev, di bin ser-kiya komisyona me de, bi plan û program karê xwe bidominin.

(Dawî)

Serokê Meclîsa Netewî ya Kurdistanê Cewher Namiq Salim:

"Tirsa wan ji prosesa demokrasiya li Kurdistanê ye"

Serokê Meclîsa Netewî ya Kurdistanê, Cewher Namiq Salim tevi delegasyoneke parlamentoyê hin welatên Eurûpayê ziyaret kîr û di vê navberê de hat Suêdê ji. Ji redaksiyona Armancê, S. Rêving û Zinarê Xamo li Stockholmê, di 19'ê Çiriya Paşin de li ser pîrsên aktuel yên Kurdistanâ Iraqê pê re hevpeyvînek çekirin Em hevpeyvînê pêşkêşî xwendevanan dîkin.

Armanc: Di 14-15'ê Çiriya Pêşîn de wezîrên dervekar yên Tirkîye, Îran û Sûriyê li Enqerê civyan, li ser musteqbelê Iraqê û dewleta Kurd a Federe hat peyivîn. Hem di preskonferansa pîstî civînê, û hem ji û deklerasiyona dawî ya civînê de dan xuyakirin ku her sê dewlet jî bi rewşa Kurdistanâ Iraqê ya nuha ne rehet in, naxwazin "erdê Iraqê" perce bibe û ji bo xerakirina, bi gotina wan vê rewşa "emrîwaqî" ya Kurdistanê li riyan digerin. Iraq jî piştgiriya civînê dike, lê ne razî ye, cîma ku ew jî besdar nebûye. Hün li ser civîna wan ci dibêjin? Gotinê wan ihtimala êrişke leşkerî jî tîne bîra mirov. Dibe ku yek ji wan, yan dudu, yan her sê bi hev re êrişê bînin ser dewleta Kurd?

C. Namiq: Sipas ji bo Armancê. Ezê pîrsê bikim sê bes. Yekem civîna wan, duym pre-skonferansa wan û şela Iraqê û sîyem jî ihtiîmalen êrişê. Beri her tişti vê civînê xuya kir ku eger di navbera van welatan de nakokî hebin jî -ku di navbera Îran û Tirkîye de problema Azerîyan, di navbera Tirkîye û Sûriyê de problemen avê, ya İskenderûn û Entaqayê heye- ew dikarin li ser mesela Kurd bêna ba hev.

Ji prosesa demokrasiya Kurdistanê ditirsin

Civîn, yan axaftin li ser Iraqê beri her tişti mudaxeleya nav karê Iraqê ye. Mafê Iran, Tirkîye û Sûriyê tuneye, bêyi besdarbûna nûnerên rasteqîn yên gelên Iraqê, qala Iraqê bikin. Ev yek tecawizeke li ser mîletê Iraqê bi gîsti. Lewra jî opozisyonâ Iraqi û me li Kurdistanâ Iraqê ji wan re got: "Eger ev civîn li ser Iraqê ye, divê nûnerên rasteqîn yên mîletê Iraqê jî besdar bibin". Qebûl nekirin. Me'nâ vê ew e ku ji bo parastina yekitiya erdê Iraqê necivîyanê û tirseke wan jî li ser perçebûna Iraqê tuneye. Bi ya me tîrsa wan prosesa demokrasiya li Kurdistanâ Iraqê ye û armanca wan jî nehêlana vê prosesê ye. Ew ditirsin ku ev tecruba demokrasiyê wê bi tenê li Kurdistanê nemîne, derbasî nav sînorênen wan jî bibe. Ew di bin perdeya parastina erdê Iraqê de, li riyan nehêlana vê prosesa demokrasiyê digerin. Mîletê Iraqê li ser musteqbelâ Iraqê biryare û dide. Iro ev mîlet di bin zulma diktator Saddam de dij. Nûnerên rasteqîn

yên vî mîletî jî opozisyonâ Iraqê ye ku ew jî ev in:

Tevgera netewî ya Erebî
Tevgera Demokrasîxwaz
Tevgera dîmî, ci sunnî, ci şî'e
Tevgera azadîxwaz a Kurd.

Bê guman di nav tevgera demokrat de em birayê xwe yên Asûrî û Turkmenen jî dihesibînin.

Mafê Iran, Sûriyê û Tirkîye tuneye ku li ser navê opozisyonâ Iraqê biryaran bidin.

Li ser musteqbelâ Iraqê divê ev hêz biryare û bidin. Mafê Iran, Sûri-

tîn hesibandin, di nav opozisyonâ Iraqê de ne, yan ne?

C. Namiq: Hemû hatin civîna Hewlîrê, ji bilî Beesiyên ser bi Sûriyê ve û hinek rîexistînên din yên biçûk. Lê baweriya me ew e ku ew jî di gel Iraqueke yekgirtî û demokratik in. Yen din tev hatibûn civînê.

Armanc: Opozisyonâ Iraqê cara dawiyê li Selehedînê civiya. Yek jî biryara wan ew bû ku pîstî rejîma Saddam li Iraqueke yekgirtî ji bo Kurdish sistemê federalî hebe. Hün wek parlamento û hukûmeta Kurd bi samîmiyeta aliyê din yên opozisyonâ bawer in? Ew di vê biryara xwe de samîmî ne?

C. Namiq: Em wek biryar qebûl dikin. Biryareka samîmî û ciddî ye. Çunkî tev opozisyonâ Iraqê civiyaye. Biryar daye ku piştgiriya federalizmê bike. Bê guman kes nikare bizane di dilê

Civîn, yan axaftin li ser Iraqê beri her tişti mudaxeleya nav karê Iraqê ye. Mafê Iran, Tirkîye û Sûriyê tuneye, bêyi besdarbûna nûnerên rasteqîn yên gelên Iraqê, qala Iraqê bikin. Ev yek tecawizeke li ser mîletê Iraqê bi gîsti. Lewra jî opozisyonâ Iraqi û me li Kurdistanâ Iraqê ji wan re got: "Eger ev civîn li ser Iraqê ye, divê nûnerên rasteqîn yên mîletê Iraqê jî besdar bibin". Qebûl nekirin.

yê û Tirkîye tuneye ku li ser navê wan biryaran bidin. Opozisyonâ Iraqê di kongreya xwe de -ku di navbera 27-31'ê Çiriya Pêşîn de civîya- biryara xwe daye ku piştgiriya prosesa demokrasiya li Kurdistanâ Iraqê dike, bi taybeti biryara parlamentoya netewî a Kurd ji bo federalizmê. Û daxwaz kiriye ku hemû alîkari bê kirin ji bo ku ev tecruba demokrasiyê li Kurdistanâ Iraqê bi ser keve û bibe esasekî ji bo demokrasiya li seranerî Iraqê.

Her weha opozisyonâ Iraqê biryara daye ku sistêma siyاسî li Iraqa pêşerojê: li Iraqueke yekgirtî sistemeke demokrat, li ser bingehê parlamenteîzma pirpartîti û federalizmê ava bibe. Me Kurdish di 4'ê Çiriya Pêşîn de biryara xwe da ku girêdana me ya siyاسî bi hukûmeta merkezî re li ser esasê federalizmê be. Me di deklarasîona xwe de tekîd kiriye ku di nav çarçewa Iraqueke yekgirtî, demokrat û parlamenteîzma pirpartîti de em federalizmê bi cî tînîn. Parlamentoya me nûnerâna rasteqîn ya gelê Kurd e. Her çar aliyan opozisyonâ Iraqê nûnerâna rasteqîn yên mîletê Iraqê ne û me pêk ve biryara daye ku em yekitiya erdê Iraqê biparêzin. Îcar ew cîma ditirsin?

Armanc: Hêzên Ereb, yên Islamî ku ser bi Sûriyê û Iranê ve

rêmê. Duyem bê guman hîn acizitir dibin, eger demokrasî bi însiyatîf û bi destê Kurdistan bê çespandin. Sîyem li Iraqê cara yekem e ku opozisyonâ Iraqê li ser erdê rîzgarkirî ê Kurdistanâ Iraqê ku perçeyek e ji Iraqê, bîcive û biryara xwe li ser pêşeroja Iraqê bide. Her weha welatên ku heta iro opozisyonâ Iraqê li ser erdê wan diman, pê ne xweş in ku iro opozisyonâ Iraqê li ser erdê xwe, bi irada xwe ya azad bifikire û biryara xwe bide. Eger hat û van çar welatan -divê em hesabê Iraqê jî bikin- êris anîn ser me, wê çi bê serê me? Bê guman eger ji desîte wan bê wê bikin. Lê pîrs ev e: Rê heye ku ew êrişê bînin? Mirov eger realist be, divê bîbêje ku em nikarin şerê çar dewletan bikin, lê bê şik e ku dawiya me jî nayê.

Me resmî û bi tundi êrişâ Tirkîye protesto kir

Armanc: Meha bûrî bi bahneya hebûna kampê PKK'ê li bakurê Iraqê, leşkerê Tirk ket nav erdê Kurdistanâ Iraqê. Leşkerê Tirk ji Zaxoyê jî derbas bû, heta Batufayê, Gelyê Keşanê çû, bêyi ku ji alî we ve pêrgî asteng, yan protestoyeke tund bibe. Hinek aliyan iddiâ kirin ku di navbera hêzên Kurdistanâ Iraqê û hukûmeta Tirk de li ser êrişê peymank heye. Ev iddiâ rast e gelo?

C. Namiq: Beri her tişti ev iddiâ pêkenîn e. Divê ez qala beyan û ragihandinê hukûmet û parlamentoya Kurdistanê û yên nûnerâna tevgera rîzgarkîwaz a Kurdistanê bikim. Roja pêşî ku leşkerê Tirk ketin nav axa me, me bi resmî û bi tundi ev êriş protesto kir. Hem hukûmet, hem parlamentoya kir. Min bi xwe li derive li ser êrişâ wan çend beyanen protestoye dan. Hukûmet Kurdistanê bi tundi protestoyen xwe diyar kirin. Nûnerâna tevgera azadîxwaz a Kurd Celal Talebanî û Mesûd Barzanî çendin caran ji bo ajansên Kurdistanê, Tirkîye û cihanê beyan dan û bi tundi destdirêjiya Tirkîye gunehbar kirin. Me êrişâ wan wek tecawiza ser erdê xwe û wek súcekî mezin ilan kir. Çunkî bi tenê û bi tenê hukûmeta Kurdistanê meşûla ewleñ û asayışa Kurdistanâ Iraqê ye. Hîç hêzeke din ne mesûl e. Û ji bilî pêşmergeyê hukûmeta Kurd, mafê hîç hêzekê tuneye li ser erdê Kurdistanâ Iraqê tevgeran bike.

Armanc: Ji bona ku hêzên hukûmeta Kurdistanâ Iraqê kontrola sînorêna xwe bigrin dest xwe, di navbera pêşmergeyê hukûmetê û gerîlayen PKK'ê de gerek derket û nêzî 29 rojan ajot, heta ku di 29'ê mehê de peymaneke lihevhatinê di navbera hukûmetê û

vekişîne. Li ser vê yekê li Silopiyê bi besdariya Celal Talebanî û Mesûd Barzanî jî civînek li ser tarîx û awayê vekişîne hat kirin. Biryarê vê civînê belav bûn. Û di 14'ê mehê de leşkerê Tirk dest bi vekişîne kir.

Eger ev karênu ku me kirine tev ne protesto û nerazîbûneke tund bin, lêxa ci ne?


Hêza çakûç iro ji bo me pêwîst e

Armanc: Hêza Çakûç ji bo parastina esmanê Kurdistanâ Iraqê -paralela 36 em- li Tirkîye hatiye bi cih kirin. Û di meha 12'an de car din ji bo dirêjkirin, yan dirêj-nekirina wextê wê di nav axa Tirkîye de, li meclisa Tirkîye biryartê standin. Ger Tirkîye wexta wê dirêj neke, bi ya te wek welat alternatifêke din heye ku Hêza Çakûç lê bi cih bibe? Bi vê ve girêdayî eger Hêza Çakûç nemîne, wê rewşa Kurdistanâ Iraqê ci be?

C. Namiq: Biryara man û nemana Hêza Çakûç di destê Nete-wên Yekbûyî (NY) de ye. Ew biryare dide bîmîne, yan nemîne. Tirkîye iro ji prosesê perçeyek e. Eger Tirkîye li dij biryara NY derkeve, divê dewletan ku Hêza Çakûç danîne, biryara xwe bidin. Hukûmet Tirkîye heta iro ci sînal nedane ku ewê li dij biryaren NY raweste. Em hêvidar in ku hukûmet Tirkîye li dij biryara NY raweweste. Her weha eger ci guhertin di politikaya welatân, bi taybeti wek DY, Ingîltîre, Fransa û Elmanyayê de cênebin, em bawer dikin ku wê Hêza Çakûç bîmîne. Bê guman Hêza Çakûç ji bo zemanekî ye ku esmanê Kurdistanâ Iraqê biparêze û bê guman garantiyek e ji bo ewlehî û asayışa li herêmê. Heta ku hêzên Kurd li Kurdistanê asayış û ewlehiyê têxin desten xwe ku vê prosesê dest pê kiriye û ne bes Kurd, opozisyonâ Iraqê jî ji bo parastina demokrasiyê amade ye. Eger cihan tev, eger NY biryare bide ku rewşa me têk bidin, em Kurd dikarin ci bikin? Eger dinya careke din me li vê dînyayê bê pal û pişt bîhêle, em mecbûr in careke din vegerin ser karê xwe yê berê. Bê guman mana Hêza Çakûç iro ji bo me pêwîst e. Lê eger nema, wê çaxê taktikê nû pêwîst in.

PKK ji zû de ye şerê hêzên Kurdistanâ Iraqê dike

Armanc: Ji bona ku hêzên hukûmeta Kurdistanâ Iraqê kontrola sînorêna xwe bigrin dest xwe, di navbera pêşmergeyê hukûmetê û gerîlayen PKK'ê de gerek derket û nêzî 29 rojan ajot, heta ku di 29'ê mehê de peymaneke lihevhatinê di navbera hukûmetê û



Cehwer Namik: "Miletê Iraqê li ser musteqbela Iraqê bîryare dide. Iro ev milet di bin zulma diktator Saddam de diji. Nûnerên rasteqin yêni mileti ji opozisyonan Iraqê ye." (Foto: Armanc)

PKK'ê de hate imzakirin. Gelek Kurd dipirsin. Gelo nedibû ku ev problem bê ser, bi riyan asti û qanîkirinê bîhata çareserkirin? Ci riyan din tunebûn?

C. Namiq: Şela hukûmeta Kurdistanê li hember PKK'ê ne şelege kutûpir e (ne gelsek ku iro dest pê kiriye û ji nişkêk ve ye). Vedigere bo berî 4-5 salan. Di nav Cebha Kurdistanê de gelek caran siyaseta PKK'ê li hember Cebha Kurdistanê û li hember yek bi yek hêzen Cebhê, hatiye hel-sengandin. PKK ji zû de ye şerê hêzen Kurdistanâ Iraqê dike. Ji zû de ye alaya şerê birakuijî li hember hêzen Kurdistanâ Iraqê bilind kiriye. Lî bi rastî ji tevgera rizgarîwaz a Kurdistanâ Iraqê her tim xwe ji şer daye paş, sal li pey salê me hewil daye ku em bi şeweyekî din meselê çareser bikin. Pişti raperîna 1991'an, Cebha Kurdistanê çendin cara bi serokatiya PKK'ê re têkilî danîn û xwest çareyekê bibîne, lî PKK'ê bi israrî dijiminatiya hemû hêzen welatperwer domand. Havîna par gelek caran me ji PKK'ê daxwaz kir ku tevgeren xwe yên leşkerî ji şer sînorân me bi dûr xe. Hûn dizanîn pişti serhildana par, li ser sînorân me valahiyek peyda bûbû. PKK'ê ev rewş bi kar anî û bi alîkariya Sûriye û Iranê, di nav sînorân Kurdistanâ Iraqê de kam-pên xwe danîn. Me cardin bi wan re têkilî danî û got, eger şerê gerîla didin, bila giraniya tevgeren xwe yên leşkerî veguhêzin Kurdistanâ Tirkîyê, eger xebata siyasi dixwazin, em rê didin wan. PKK'ê wek her car, tedaxula xwe ya nav karê me zêdetir kir, li gund û bajarê me, li diji Cebha Kurdistanâ antî-propagandaya xwe firehtir kir, ket nav bajarê me wek Hewlîr, Dihok û Zaxo. Li ser riyan noqteyên kontrolê danîn, dest pê kîrin heqê gumrikê û vergî ji gelê me standin. Xelk digirtin, ceza didan wan. Ji bili gundiyen ku xwestine biçin ser gundênen xwe, çendin pêşmergeyên hêzen Kurdan bi destê wan hatin kuştin, yan winda kîrin. PKK'ê roj bo roj li ser kîrin xwe berdewam bû, heta

ku vejerin ser gundênen xwe. Nêzîkî 350 gundênen me hene ku ku gundiyen me dixwazin vejerinê û ava bikin, PKK dibêje, na, eger hûn dixwazin bênen, divê hûn di bin qanûna şoreşa me de bijin, yan em qebûl nakin. Di dîroka Kurde de bi tenha rejimek heye ku kariye girêdana me ya netewi ve-

Bî baweriya me ci be bila bibe, danûstandin hebe, yan nebe şela Iraq û PKK'ê yek e. Iraq prosesa demokrasiya me wek listika împerializmê û tedaxula nav karê Iraqê nişan dide. PKK ji eyîn tiştî dike. Iraq dibêje hilbijartin derewek e, xelkê bi zorê dibin, PKK ji welê dibêje. Iraq dibêje Kurd ji bo vesartina reva xwe hilbijartinan dikin, PKK ji dibêje hêzen Cebha Kurdistanê ji meydana xebatê reviyan, şikestine, dixwazin eyba xwe bi hilbijartinan veşerin. "argument" ci bin, siyaseta Iraq û PKK'ê yek e... Ferz bikin sal 1946 e, Cumhuriyeta Mahabadê heye û Qazî Mihemed serokcumhur e. Em Kurden Kurdistanâ Tirkîyê, yên Kurdistanâ Iraqê, yên Kurdistanâ Sûriyê êrisê bibin ser Cumhuriyeta Mehabadê. Û nimuneya rehmetî Barzanî. Ferz bikin ku Barzanî biçîwa, li diji Qazî şer bikira, dîroka me wê ci li ser Barzanî binivîsanda?

getîne, ew ji rejîma Saddam Hûsîn e ku valahiyek xist navbera Kurdistanâ jor û jér. Zêdetir ji 40, li hînek ciyan 50 km. vala kir û bi plan û program xebitî ku girêdana ruhî, aborî, û civakî yên Kurdistan li bakur û başûr ji hev bêne vegetandin. Me talukeya vê politîkayê zanîbû, lewra ji me xwest zûtirîn wext gundî ji gundênen stratejîk yên nêzî bajaran û ji bajaran mezîn, vejerine ser gundênen xwe û bi ci awayî be, dest bi jiyana xwe bikin. Her weha ev şerîta sînor ji bo emniyeta erdê me giring bû. Me di dema şoreşa xwe de fam kiribû ku vê valahiyê ci problem ji me re derxistibûn. Ev 350 gund ji aliye çandinê ve baştirîn erdê Kurdistanâ Iraqê ye. Lî PKK'ê qet guh neda van û rî neda gundiyan ku vejerin ser gundênen xwe. Li ser vê yekê me cardin têkilî bi PKK'ê re danî, lî vê carê ji em tehdîd kîrin û gotin kesen ku bênen van deran wê bênen girtin û ceza kîrin. PKK'ê roj bo roj li ser kîrin xwe berdewam bû, heta

îcar binavkirina wê wek listikeke împerializmê heqareteke mezin e li miletê me, xizmet e bo rejîma Saddam, xizmet e bo dijminen Kurdistan.

Şela Iraq û PKK'ê eyîn ye

Armanc: Te got bi tenê du alî li dij vê prosesê rawestîyan. Yek Iraq, ya din PKK. Ev tesadufi ye, yan danûstandinek di navbera wan de heye?

C. Namiq: Bi baweriya me ci be bila bibe, danûstandin hebe, yan nebe, şela Iraq û PKK'ê yek e. Iraq prosesa demokrasiya me wek listika împerializmê û tedaxula nav karê Iraqê nişan dide. PKK ji eyîn tiştî dike. Iraq dibêje hilbijartin derewek e, xelkê bi zorê dibin, PKK ji welê dibêje. Iraq dibêje Kurd ji bo vesartina reva xwe hilbijartinan dikin, PKK ji dibêje hêzen Cebha Kurdistanâ ji meydana xebatê reviyan, şikestine, dixwazin eyba xwe

hilbijartinan. Ku hilbijartinan desî pê kir, li hemû cihanê bi tenê du alî li dijî hilbijartinan derketin û ew wek listika împerializmê bi nav kîrin. Yek rejîma Saddam bû. Du PKK bû. PKK ji roja yekem a hilbijartinan bi hemû hêza xwe ve li dijî vê prosesa demokrasiye rawestîya, propagandeyek dijwar li dij kir û di pratîkê de jî xwest ku bi xelkê bide qebûl kîrin ku her tişt bi destê emperyalizmê çedîbe. Ev gunhekkî mezin bû. Ev perçiqandina kerameta milletê me bû. Çunkî ev tecruba demokrasiye berî her tiştî berhemê xwîna 200. 000 şehîden me ye. Ji hukûmeta Berzencî he-

ta iro bêbir me xwîna xwe rijandiye ji bona ku bigîhin rojek weha. Şela PKK'ê heqaretik e bo xwîna şehîdan. Ev tecruba bi şahidiya dînyayê, di atmosfereke azad de bi cî hat. Zêdetir ji 1 milyon insan raya xwe dan. Hurmet ji bo van insan û dengen wan bes e ji bo hurmata vê prosesê. PKK'ê ev heqaret jî li me kir. Iro li Kurdistanâ Iraqê %90 welatê me wêran e. Ji 5000 gundan 4500 gund nemane. Zêdetir ji 20 bajarêne me yên biçûk nemane.

bi hilbijartinan veşerin. "Argument" ci bin, siyaseta Iraq û PKK'ê yek e. Paşê kî cesaret dike li dijî yekem tecruba demokrasiye, li dij parlamento Kurdistanâ dest bavêje çek. Li ser vê yekê nimuneya me ya dîrokî heye. Ferz bikin sal 1946 e, Cumhuriyeta Mahabadê heye û Qazî Mihemed serokcumhur e. Em Kurden Kurdistanâ Tirkîyê, yên Kurdistanâ Iraqê, yên Kurdistanâ Sûriyê êrisê bibin ser Cumhuriyeta Mehabadê. Û nimuneya rehmetî Barzanî. Ferz bikin ku Barzanî biçîwa, li dijî Qazî şer bikira, dîroka me wê ci li ser Barzanî binivîsanda?

Paşê di feydê kî de ye ku iro ev tecruba me nemîne? Kî dixwaze têk bibe? Biserketina tecrûbê di feydê miletê Kurd de ye? Eger di feyda wê de be, dijminatiya wê xizmet e ji bo dijminen miletê Kurd.

Gelek cara cihê pîrsê ye: Me bi salan li Kurdistanâ Iraqê ji bo otonomiye xebat kiriye. Ji 1961'ê û vir de bi yeknafes me têkoşin daye, bi ser ketine, şikestine, perîşan bûne, heta gihiştine vê rojê. Ji bo otonomiye Iraq bi çekê kimyayî qira me tîne, mecbûr maye Kurdistan teslimî me kiriye. Cara dawî me di 14'ê mehê de tekîd kiriye ku em di nav çarçewa federalî de li Iraqke yekgirtî bişîn û opozisyonan Iraqê bi me re ye, lê welatê dorûber dibêjin: "naxê ev cudabûn e." Îcar rizgarkirina her çar perçen Kurdistanâ û avakirina dewleteke Kurdi a yekgirtî slogan PKK'ê ye, PKK xwe wek rîexistineke marksîstlenînist dide pêş, û alîkariyê ji hukûmeteke Panarabîst, wek ya Sûriyê digre, alîkariyê ji hukûmeteke İslâmî, wek ya Iranê digre. Û peywendiyê wê bi Iraqê re hene. Ez bawer nakim ev sê dewlet bixwazin ku her çar perçen Kurdistanâ rizgar bibe û dewleteke Kurdi bê avakirin. Lî gelo çîma alîkariya PKK'ê dikin? Çîma em doza otonomiye dikin û di qonaxa serketinê de ji bo guftûgoyan diçin Bexdayê, lê Iraq vê dijminatiye bi me re dike. Lî rîexistineke marksîstlenînist, doza her çar perçen Kurdistanâ dike, çekan ji didinê, topan ji didinê, kam-pên serokatiya wan li Şam, û li Urmiyê ye û ji 1985'ân û vir de ye ku têkiliyê PKK'ê bi Iraqê re ji hene.

PKK'ê em ji dijminan ji dijmintir ilan kîrin

Tevî her tiştî me dîsa muhawele kiriye ku bi riyan astiyane û birayane gelşen xwe çareser bikin. Ku PKK dev ji metodênen xwe yên ne rast berde, tedaxulî nav karê me neke. Lî PKK'ê em ji dijminan ji dijmintir ilan kîrin, ji devê sekreterê xwe yê gişî parlamento û hukûmeteke Kurd û tevgera rizgarîwaz a Kurd wek nokeren împerializmê bi nav kir. Got emê ji dijmin zêdetir biçin ser Kurde. Her ci gotinê ne rast û dujûnîn mestir e, jê gelek asêtir e û nifuseke pir heye. Lî em qebûl nakin ku ji nav sînorân me -ku hebûna wan waqî'ek e- êrisê bibin ser Tirkîyê û bi vî awayî ji bahaneyen bidin destê Tîrkan ku eziyete bide wan ji û me ji. Hewildana dawîye di 2'ê meha 10'ê de me li gel PKK'ê kir. Bi serokatiya Noşîrwan Mustefa me heyetek şand Xakurkê ku bi Osman Ocalan re bipeyive. Osman Ocalan dijbeje. Eger hûn bela xwe ji me venekin, ermê bênen Celal Talabanî û Mesud Barzanî ji Hewlîrê derxin, bibin. Ü êris birin ser kam-pên YNK û 3 pêşmergeyên wê şehîd kîrin, li Zaxoyê êris birin

li ser sînor nemane. Em berpirs in li hember herêma Kurdistanâ. Hemû sînorê Tirkîyê û Iraqê re di destê me de ye. Sînorê Sûriyê ku girêdan bi Kurdistanâ Iraqê re heye, di destê me de ye. Sînorê Iranê ku girêdan bi Kurdistanâ Iraqê re heye, di destê me de ye. Em wek hukûmet iro li hember ewlehi û asayısa van sînoran berpirsiyin. Hîç dewletek li cihanê qebûl nake ku sînoran wê vala bin, xelk bêne, éris bibin ser. Gotin: "Naxê sînor yên Kurdistanâ ne, sînor nînin". Me got, baş e ser çava, madem sînor nînin, kampa serokê we û serokatiya we li Sûriyê ye, Kurdistanâ Sûriyê ji heye. Kerem kin ji wir hicûm bikin. Kampen serokatiya we li Urmiyê ne, Kurdistanâ Iranê ji heye, kerem kin ji wir hicûm bikin ser Tirkîyê. Eger Tirkîyê ne razî be, Iran dewlet e, Sûriyê dewlet e, di Karîn alîkariya we bikin, topê wan hene, tanken wan hene, balafirê wan hene. Lî yên me ne top û ne balafirê me hene û welatekî jihevetkî di nav destê me de ye.

Armanc: Bersiva wan ci bû?

C. Namiq: Bersiv gotin: "sînor ji bo me nînin, em azad in û ev der Kurdistanâ e." Me ji got baş e. Va ye Kurdistanâ Iraqê, meydana xebatê ye. Eger rast e çîma hûn li dij Seddam şer nakin? Çîma li dij Sûriyê şer nakin? Çîma li dij Iranê şer nakin? Va ye li Kurdistanâ Iranê şoreş heye, kerem bikin, pêşmergên xwe bibin, li dijî Iranê ji bo Kurdistanâ şer bikin. Va ye Kurdistanâ Sûriyê, ku Sûriyê itirafê bi hebûna miletê Kurd nake, kerem kin şerê wê bikin. Va ye Seddam -ku dema bi çekên kimyayî qira me tanî, kam-pên we ji hebûn, dest bi we nedakerem kin şer bikin. Ü eger hûn li dijî Tirkîyê şer dikin, va ye Kurdistanâ Tirkîyê.

Her di wan deman de hukûmeta me bîryarek derxist ku tu hêzen çekdar li Kurdistanâ Iraqê şer bi partî û rîexistinan ve nemînin. Hêzen hemû partîyan, di serî de ji yên PDK-î û YNK'ê û yên partîyên din. Tev partî û rîexistina ev bîryarek hukûmeteke qebûl kir, ji bili PKK'ê. Civîn li ser civînê kîrin, belavok û rojname belav kîrin ku xelk li dij hukûmete rabe ser xwe. Dawîya dawî me du rî dan ber wan: Eger wek gelek alîyîn din di nav sînoran me de dixwazin xebatî şiyasî bibin, hurmata me ji mafe mirovî re heye, bila kerem kin. Na eger şerî gerîlayê dikin, bila herin Kurdistanâ Tirkîyê ku çar, pêncara ji Kurdistanâ Iraqê şer, tîrkan ku çar, jê gelek asêtir e û nifuseke pir heye. Lî em qebûl nakin ku ji nav sînoran me -ku hebûna wan waqî'ek e- êrisê bibin ser Tirkîyê û bi vî awayî ji bahaneyen bidin destê Tîrkan ku eziyete bide wan ji û me ji. Hewildana dawîye di 2'ê meha 10'ê de me li gel PKK'ê kir. Bi serokatiya Noşîrwan Mustefa me heyetek şand Xakurkê ku bi Osman Ocalan re bipeyive. Osman Ocalan dijbeje. Eger hûn bela xwe ji me venekin, ermê bênen Celal Talabanî û Mesud Barzanî ji Hewlîrê derxin, bibin. Ü êris birin ser kam-pên YNK û 3 pêşmergeyên wê şehîd kîrin, li Zaxoyê êris birin

Nîv rûpel

August STRINDBERG

Malê bar dikir, barê dawî jî çûbû; kirêçi, xortekî ku qeytaneke reş a hez-nîtiyê li dora şewqê wî yê len-gerî -fotêr- gerandî cara dawî li hundir xêni çû û hat, ji bo ku bizanibe ka tiştek ji bîr kiriye ya na. Nâ, wî qet tiştek ji bîr neki-ribû, qet tiştek; û wisa derket der, li hêwanê birtyara xwe da ku li ser jiyanaya xwe ya di vî xanî de buhurandibû édi hîç nefikire. Lî belê, li hêwanê, li hindî telefonê nîv rûpel kaxeta bi dîwêr ve mîxkirî dît; kaxet bi destnivîsên cihê cihê tije num-reyên telefonan bû, hin jê bi murekebê bi dûzan, hin jê ji bi qelema reş ya ji sor bi şiklekî tevlihev hatibûn nîvisandin. Li ser vê kaxetê her li ber çavan bû, hemuyê tarixa wî ya xweş ku di nav van du salêna dawî de wî di vî xaniyî de derbas kiribû, hemû tişte ku wî dixwest ji bîr bikira di vê kaxetê de bûn; demek ji jiyanaya însan li ser nîv rûpel kaxet.

Wî kaxet ji dîwêr kir; kaxete-ka zer a muswedê ya sîpiçolkî bû. Danî ser soba kevirîn û xwe bi ser de xûz kir û bi yek derbê xwend. Di serî de navê wê hebû: Alice, ew navê ku wextekê ji bo wî navê herî xweş bû, çimkî ew dergîstiya wî bû. Û numra 1511. Wek numreyên sitranên kitêba îlahî ya dêrê xuya dikirin. Dûre navê

banqê dihat: Banqe, ciyê karê wî bû, karê muqedes, ku nan, mal û jin dabûyê; esasê hebûn û jinê bû. Lî cixizek di ser re hatibû kişandin. Çimkî banqe hatibû girtin, lê bi vê yekê re ji piştî demeke kin a bi endîse banqeke din ew xelas kiribû. Navên gulfiros û paytoncî li pey hev dihatin. Dema nişanîyê bû, wê wextê, bêrika wî tije pere bû.

Dûre: Navên mobilyefiroş û tahmîkarê mobilyan dihat. Ma-lê ava dike. Numra telefona firma himaliyê: Tê dikeve xêni.

Numra telefona gîşeya o-perayê: 5050. Ew bûk û zava-yen nuh in û rojêن Yekşemîyan diçin operayê. Wexta wan a herî xweş, ew bûku gava ew ji xwe re li pişt sahnê, li welatê çirokan bê deng, di nav huzûr û harmoniyekê de rûdiniştin.

Li vir navê mirovokî dihat ku ser wî xêz bûbû. Ew hevalekî wî bû, ku di civatê de gîhiştibû ciyekî hinekî bli-lind, lê nikanibû mesûdiya xwe bidomîne, bê taqet ket û ji mecbûrî derket rîwîtiyeke dûr. A hewqasî nazik e.

Li vir xuya dikir ku tiştekî nuh li jiyanaya wan zêde bûye. Bi destnivîsa jinikê û bi qelema qurşûn hatibû nîvisandin: "Pîrik". Kijan pîrik? Wîî, erê ew, ew canika manto mezin, ruyê

nas, ku bi bêdengî dihat û tu carî ji salonê derbas nedibû, bileks ji koridorê derbasî oda razanê dibû.

Li bin navê wê Tixtor L. hatibû nîvisandin.


Cara pêşî bû ku navê xiz-meke wî li vir xuya dibû. Nîvisibû: "Dê". Xwesiya wî bû, ji bo ku rehetiya bûk û zavayê nuh xera neke hertim bi kibarî xwe ji ber çavan dida alî, lê nuha rew-şike istîsnâ bû û bi kîfxweşî dihat, ji ber ku hewcedarî bi wê hebû.

Li vir bi qelemeke hişin û sor nîviseke xwaro maro dest pê dikir. Dayîra kardîtinê: Ciwanika xidama malê bar kiriye, yan ji wê yeka nuh bigre, ev yek baş nehat bîrê. Dermanxane. Hiiii! Dinya tarî dibe! Fabriqa şîr. Temiya şîr ji vir tê kîrin, şîrê pa-qîj.

Dikana biharatçî, quesab û hwd. Destpêkiriye karê malê bi telefonê tê meşandin, gava ku xanima malê ne li malê be. Na, ji ber ku ew di nav ciya de ye. Wî nekarî rîza li pê tê bixwenda, çimkî rîz li ber çavên wî wek rewrewkê li bin guhêñ hev dîketin, wek yekî ku di bahrê de li ber fetisandinê ye, û çavên xwe di nav ava şor de li tiştna digerîne. Îcar li vir hatibû nîvisandin: Buroya gorkirinê - definkirinê-. Ev têra xwe gelek tişti dibêje! Tabût: Yeka mezin û yeka biçük, hat bîrê. Û di hundur parantêzê de hatibû nîvisandin: Ji ariyê.

Dûre diqediya! Bi peyva a-xê bi dawî hat bû; û wehaye ji. Lê wî kaxeta sîpiçolkî girt,

Lê wî kaxeta sîpiçolkî girt,



August Strindberg, ji nîviskarêñ Swêdî yê herî bi nav û deng e. Ew li paytexta Swêd, li Stockholmê (1849-1912) hat dinê û li vî bajarî ji mir. Her çiqas Strindberg di warê çirok û romanê de ji gelek berhemên giranbiha li pey xwe hişibe ji, lê ew li dînyayê bêtir wek nîviskarekî piyesan (dramatiker) tê naskirin û deng daye.

Den Fredlöse (1871, Yen Afaroz bûne), Mäster Olof (1872, Olof Xoce), Röda Rummet (1879, Oda Sor), Tjänstekvinnans son (1.4.1886-87, 1909, Lawê Xizmetkarêkê), Fadren (1887, Bav), Fröken Julie (1888, Julieya Mat-mazel) û Înferno (1897, Cihennem) ji berhemên wî çend hebêñ pirr meşûr in.

maçî kir û kir bêrika hundur ya saqoyê xwe.

Du salêna jiyanaya wî di van her du deqîqan de wek şerîta filîmekî ji ber çavên wî derbas bûn.

Gava ji hundir derket ew ne piştxûz bû berevacî, wek miro-

vekî serbiliind û şad serê xwe tîk kir; ji ber ku jê re wer hat ku ew xwediyê tişte herî şîrîn e. Çiqas bextres hene ku tu carî nebûne xwediyen vî tişti!

Wergera ji Swêdî:
Zinarê Xamo

Rono û sirûdêñ bêrikirinê

Beyaniya biyaniyê


Ehmed HUSEYNÎ

Yara min... Herdem bi navê te yî gi-ranbuha destpêk hilata xwe dihû-ne... Xatir ji pêla dawîn dixwazim. Ji tiliyên oxira rûres, tîrs û saw, xew-revin û lerz, tevzinok û serêş, dipijiqin. Şeva kî-rassipî wekû şîrê dayikan, xwe berdide terk û xaçerê-kên giyan...

Bi koteke termê xwe dikişkişinim, di goristana biraninan de, bê kîl û bend, bê kaj û alêna kesk, tenha-tiya xwe, bêdengiya zuha ya lîlan û katjimêran, dime-yinim...

Çavên te mîna du stérkên havîna me diçurisin, zey-zefûn porê te min agahdarî bi-hareke şewitî di-kin. Û bi bîna hinaran ya ku ji sînga te difûre, hildiperikim beyaniya biyaniyê...

Em sê kes in. Gemiya me li nik perrîn Derya Baltîkê radiweste. Em ji, di nav pen-cen xwedanê pena-beran de, mit û



mat, surdar û rûsar, radi-westin. Û **YSTAD** bûka ku bi berfê hatîye xemilandin, hê ji himbêza xuristê hişyar nebûye. Porê me gurişki ye, gewriya me zuha ye, dranên me ji nikotin û peyvan zer bûne, barê me xwêdan e, bêrikén me mişt toz û hetav in, û hişê me bi ren-gê sinbilan, bi awazên gula berberô dijene.

YSTAD vediciniqe. Memikên xwe dinixumine, pêşenika wê dibe listgeha çû kên dilbijandinê û newqa wê dibe hêlinâ xirecirê. Ji nişkê ve mistek pirs bi ser me de direşine.

- Hûn ji kijan welatî ne...?

- Em...???

Yara min... ma ew serde-ma deyûz têt bîra te?

Ma têt bîra te gava ku agir, ez û tu û çiyan ji hevirê tîbûnê afirandin?

Tu bûyi balgeha rona-hiyê, di esmanê birîna te de keskesoreke şermok diponije, seranseri nalina te bi

henasa gulan û bi goşiyen bêrikirinê, mist dide.

Ez bûm neviyê xweliya tewankar, di xacépirsa qonaxê de wişeyek bê bersiv im. Di neynikêñ beyaniyê de li çarenûsa xewna xwe temâşe dikim, gulyîyen he-wara te ji fikandina bayê kur hildikim, pênuşa xwe bi hibra şevê şil dikim û li ser berfê, bi tipêñ qerfê di-nivisim:

Çiyayo... Pişta te xûz bû di bin barê xewnê de !

Tu li gerdenika rokê di-geri di rojhilata xwînê de !

RONO... Darêñ hinara li bajêr, zaroktiya min dina-sin, di sibehêñ havîne de, li beranberî êrişen me radest û mêsînî bûn. Eger bîna te teng bû, biçe nik darek hinarê, dê sîber û tama min bi ser te de biniqutin.

Dilê min jî nuha di demûşê de digevize. Av bi devê min dikeve, hinar nînin, şevê dişkinim, lib bi lib taristan û bêrikirinê dadiqurtinim.


Ev dinya ji Zaro Axa re jî nemaye

- Kurdê ku li cîhanê wek Tirk hatiye nasandin-

ROHAT

Di roja 29.6.1934'an hemû nûçegîhanê cîhanê ev nûça jérin ji Stenbolê bi rê kirine: **L i cîhanê mirovê herî kal mir.** Angorî van nûçeyên kurt, navê vî kesê gelek bi emir **Zaro Axa** bûye û 160 salan jiyaye (1774-1934). Rojnamevan û ajansên Tirkîyê, Zaro Axa wek Tirk dane nîşandan û vê nûçeyê wusan jî di gelek rojnamen cîhanî de cih girtiye.

Berî çend salan dema ez di çavkaniye Swêdî de li ser tema Kurdî dixebeitim, cara pêşin min navê Zaro Axa di nav rûpelên pirtûkekê de dît. Paşê ez bi pey dokument û nivîsin derheqê Zaro Axa ketim, min çend nivîs û hin sûretên wî jî ditin; ev çavkanî Swêdî, Tirkî û Ingilizî bûn, ez di tu çavkaniyeke Kurdî de rastî serpêhatiya Zaro Axa nehatim. Ji ber ku di dema sala mirina Zaro Axa de, li Kurdistana Tirkîyê tu rojname û kovareke Kurdî derne-diket, zordesiyeke mezin û nedîş



Zaro Axa

bi xwe Kurd bûye û di sala 1774'an de li qezake bajarê Betlisê bi navê Mûtkî hatiye dinê. Navê bavê wî Şemdin, navê diya wî Mis Xanim bûye. Ew gelek caran zewiciye. Zaro Axa gelek salan

kal li cîhanê daye nasin.

Zaro Axa angorî zaniyariyê cuda tevî 6 şerîn mezin dibe, di sala 1799'an li dijî ordyen Napolon li dorberê Acre ser dike. Yekî reqemhez demekê li ser jîyîna Zaro Axa serê xwe êşandiye, angorî reqemên wî, Zaro Axa tam 1884 mehan jiyaye, ev dike 58305 roj û qelbê wî 1306800 caran lêxistiye. Zaro Axa 12 caran zewiciye. 3 gurçikên wî hebûne. Hejmara nevî û neviçirkên wî li dora 100 kesî bûne, dema dimire qasî 30 nas û pismamên wî ji bo xatirxwestinê hatine Stenbolê.

Zaro Axa di roja 29.6.1934'an de li Stenbolê di 160 saliya xwe de ji vê dinyayê bar dike. Mirina wî gelek surpriz nehatiye hesibîn. Ji ber ku salen wî ji sînorê normal edî derbas bibûn. Ew di nexweşxana Etfal de can dide, angorî daxwaza wî li goristana Eyup tê veşartin. Angorî rojnameke Swêdî (Svenska Dagbladet) Zaro Axa di rojîn xwe yên dawîn de gelek xemgîn bûye, ji ber ku mirovan dest pê kiriye vê carê şik birine ser kalbuna wî ya 160 salî. Roja şîna wî dengê qîrîn-qîjîna keçeke Zaro Axa ya 65 salî her ali tevli-hev kiriye: "Axayê min, axayê min, tu ji vê dinyayê têr nebûyi û çûyi..."

Tacklade av
dâ de 160 åren
blevo ifrågasatta.

Världens äldste man,
Zaro Agha, avlidet
i Konstantinopel.



Zaro Agha.

KONSTANTINOPEL, 20. juni.
(Times) Zaro Agha, den äldsta mannen
i världen.

Zaroya da kalmıyan dünya

**Yüz ellilik ihtiyârin atmış beşlik
kızı arkasından haykırıyor..**

Agam agam dünyaya doymadangitti

Atalar, ne güzel aylı-
lemîstir: Az yaşa, çok
yaş aksaat gelir başa.
Ölüm kus, doğumun-
dan yüzelli yedi yıl son-
ra, Zaro Ağamın başına
da kondu.

Yeryüzünün en yaşlı
adımı, gün geldi ki ya-
şamasunu döndü. Eski
bir din masalında anla-
ttırılır: Bin yıldan fazla
ömür ailen Nuh peygâm
berer:

— Dünanya ne gör-
dün? diye sorunular.

Nuh gümüşür:

— Dünaya iki kaplı
bir han. Görmemez
mam bir oldu. İçerde
ne olduğunu görmede ve
kit kalmadı ki... demis.

Açaba aynı soruya yine:



Världens
äldste
har avlidit.

KONSTANTINOPEL, fredag.

Di çapemeniya cîhanê de Zaro Axa

li ser weşanenê Kurdî yên peri-yodik hebû. Ez bawer dikim ji ber van dijwariyan serpêhatiya jîyîna Zaro Axa wusan hatiye ji bîr kîrin. Bi rastî jîyîna wî gelek balkes û heweskar e, hêjîyî zanîn û hînbûnê ye.


Zaro Axa bi xwe Kurd bûye û li Kurdistana hatiye dinê. Lî belê di gelek rojnamen van salan de ew wek Tirk hatiye nîşandan, wek mîsal rojnama Swêdî Aftonbladet, ev Kurd wek "Zaro Axa" daye nasin. Ji ber ku Zaro Axa li cîhanê kesê herî kal dihate hesibandin, bala medya cîhanê hertim li ser wî bû, bi taybetî jî ev bal li dor roja mirina wî berev dibû. Zaro Axa li cîhanê gelek baş dihat naskirin. Tirkîyê, ji ber vê popularita Zaro Axa, xwestiye navê Zaro Axa bi kar bîne, xwe li ber çavê cîhanê şîrîn nîşan bide. Lewra jî bi destê wî girtiye, ew welat bi welat geran-diye, wek hîrçekî daye listinê û bîriye welatên dûr, wek İtalya, Amerika, Ingiltere... Nûçeyen ku li ser jîyîna Zaro Axa çap bûne, bê hejmar bûne. Serpêhatiya wî sed carî hatiye dubare kîrin.

Kî ye Zaro Axa? Angorî agah-dariyê ku em lê rast hatine, ew

Çavkanî

- 1) Sven Auren, Kemal står näven i bordet, Stockholm, 1934, rûp. 142-144
- 2) M. Salabatîn, Zaroya da kalmayan dünya, Milliyet, 30.6.1934
- 3) Vera Beaudin Saeedpour, The Resurrection of Zero Agha, Kurdish Times, vol.1, no:2, 1986, New York
- 4) Aftonbladet 29.6.1934
- 5) Dagens Nyheter, 30.6.1934
- 6) Svenska Dagbladet 30.6.1934

Zaro Axa dema li Amerîkayê (1930)



Weşanenê Nuh



Amadekar: Rohat

Lale Yalçın-Heckman, *Tribe and Kinship among the Kurds (Di Nav Kurdistan de Esîrtî û Pîsmamî)*, Weşanxana Peter Lang Frankfurt am Main, 328 rûpel, Frankfurt, 1991

Lale Yalçın-Heckman di vê lêkolîna xwe de pêwendiyen eşîrtî û pîsmamtiya di nav Kurdish de analîz dike. Lale Yalçın-Heckman bi xwe etnolog e, ev çend sal in ku ew li ser Kurdish kar dike. Li Universita Londonê xebata xwe ya li ser Kurdish wek xebateke doktorayê pêk aniye. Wek warê xebatê ji xwe re Kurdish li dorberê bajarê Çolemêrgê hilbijartîye, di vê lêkolîna xwe de jî wek model rewşa Kurdish vê navcê daye ber çavan.

Edip Polat, *Bilim Dilinde Kürtler ve Kurdistan (Di Zimanê Zanîstî de Kurd û Kurdistan)*, Weşanxana Öteki, 174 rûpel, Enqere, 1992.

Edip Polat bi xwe bîolog e, heta niha li ser Kurdish çend pirtükîn wî derketine. Di vê pirtükî xwe ya nuh de nivîskar li ser navê 83 hîşinayî û 9 heywanen ku bi navê Kurdish hatine binavkirin, disekine. Wek tê zanîn gelek hîşinayî û heywanen ku cara pêşin hatine ditin û zanîn ji aliyê pisporan ve bi zimanê Latînî wek Kurdishicus, Kurdicus, Kurdicum, Kurdishanica hatine bi navkirin û ev nav bi salan wusan jî di literatûrê de mane. Wek di pirtükî de jî tê xuyan zanîngehê û sazgehê Tirkîyê vê yekê wek gavê separatist dibînin û dixwazin navine din li van hîşinayî û heywanan bikin.


Malmisanij, Mahmûd Lewen-dî, *Rojnamegeriya Kurdi (1908-1992)* 11, 162 rûpel, Stockholm 1992.

Cilda yekemin ya vê lêkolîne wek tê zanîn berî çend salan di nav weşanenê Jîna Nû de derketibû. Di vê cilda duwemîn de her du nivîskarên Kurdish li ser diroka rojname û kovarên ku piştî sala 1981'an li Kurdistana Tirkîyê çap-bûne, disekinin, li ser van weşanen agahdariyên kurt didin. Ji aliyê din ve çend zaniyariyên li ser weşanen ku berî 1981'an derketine jî, di vê lêkolîne de cih girtine.



Ahmet Arif, *Min längtan har slitit ut bojorna* (Min ji hesreta te qeyd-zincir kevin kîrin), Weşanxana Hiddekel, 66 rûpel, Stockholm, 1992.

Ev cara pêşin e, pirtükâ helbes-tan ya Ahmet Arif bi zimanekî Ewrûpi tê weşandin. Wek tê zanîn ev pirtükâ A. Arif heta niha li Tirkîyê 25 caran hatiye çapkirin û gelek deng daye. Tema helbesten Ahmet Arif bi taybetî li ser rewşa Kurdish e. Pirtük ji alî Eshat Ayata ve hatiye wergerandin.



Celîle Celîl, 1880 Kurt Ayaklan-ması (Serhildana Kurdish ya sala 1880'yi), Weşanxana Jîna Nû, 151 rûpel, Stockholm, 1992.

Diroknasê Kurd Celîle Celîl di vê lêkolîna xwe de li ser babeta serhilda-na Şêx Ubeydullah disekine (1880). Ev lêkolîna cara pêşin li Moskovayê di sala 1966'an de bi zimanê Rûsi der çûye. Ev çapa nû, Yaşar Abdülselam-oğlu wergerandiye zimanê Tirkî. Di dawiya pirtükî de çend raporên ku di wan salan de hatine nivîsin, cih gitine. Dîsa di dawiya lêkolîne de em rastî şemake li ser koka malbata Şêx Ubeydullah jî tê.

Mİ ŞEX SE'İD Dİ

Malmisanij

Serra 1925 di, rēbereya Şex Se'idi di Kurdan ver a idarekerdoxanê Dewleta Türkiye sere hewa na. Labelê idarekerdoxanê Türkiye bi orduyanê girdan (xişan) ramit Kurdan ser, bi goniwerez şarê ma qir kerd. Ci ceni ci camerd, ci pil ci wurdék zar û zêc vistî sungulan ver, tifingan û topan fek a nay, bi des hezaran (hinzaran) mērdimî kiştî. Heta ewro (eyro) nê cengê Kurdan û Tirkân ser o Türkiye ra bigîri heta Amerika zav nuşte (yazı) û kitabî nusiyay labelê Kurdan bi xwi no ware di zaf çî nênuşto. Awnanê ki nuşto zî bi ziwanê ma Kurdkî nênuşto. Pîr û kalanê ma cematan û odan di no ware di zaf çî vato labelê kesî polê xo to nêkerdî, xatirayanê nê camerdan û ciwanikan ra çî nênuşto. Kesê ki nê cengî miyan di bî yan zî sahîde hedîseyanê aw rojî bî, ewro verra verra kemî benî. Qe nêbo ewro lazim o ki zanayey ma xatirayanê enasar mērdiman binusû. Ganî ma binusû ki him tarixê mucadeley millleta maya bindesti û ta'da barbareya kolonyalistan kesî vîrî nêşero him zî ma tarixê xwi ra xeberdar bî.

Bi no fikir ez tiya di tanî xatirayanê yew eskerê Şex Se'idi nusa. No mērdimo ki behsê aw (ay) rojan keno, yew dewa qezay Pîranî ra wo. Vatisê yê gore, ewro o neway û hîrê serre wo. Wextê Cengê Şex Se'idi di (garê Pîranî vanî "Herbê Şex Se'idi") vîst û ses serre biyo. Semedo ki no camerd bi xwi nêzano biwano û binuso mi vatisê yê gore nê xatirayê yê nuşti.

Mİ SENÊWA ŞEX SE'İD Dİ?

Şex Se'id Efendi bi xwi Xunus di bi. Zav pêt bi, çer-panç kerî pesê jey bi. Jey (yê), verî her şaristan di mērdimî dîbî, vatbi "Herkes cay xwi di destê xwi hukmatê xwi ser nî. Ma inî qanunî qebul nêkenî." Şêx keye û debara xwi heme tê di verday, werîst fekê xwi memleketê ma kerd, hame. Ma pey hesey (hesiyay), va "Şex Se'id ha dopolê Pirdê Dimli (1) di yeno!" Hîrî sey - çar sey ten însan şarê ma ewta ra heta Dimli debibi, ma şîj jey ver a.

Ma şî dokinarê Vêrdan (2), dokinarê Pirdê Dimli, Şêxî ver a. Şex û imbazê xwi hamey Dêrey (3), a şew Dêrey debî. Şex Se'id, Dêrey di şî key Huseynê Avlay.

Liji (4) ra bigîri heta Hêni (5), o kure ra ki hamewo, însan rey kewto, pîya hamey. Înê kinarê Kirdan (6) ra şar reydi zav bi. Mîrey û begî espar bî, şaro bîn peye bi (7). Ez ay wext zewjiyaye biya. Mi newe key xwi Qojigî (8) ra ardbi, key mi yew qulikeki bî, hima heştê tenî mêmânanî mi bî.

A şew Şêxî va "Ez sôna Şex Pîr Mesûrî (9) veynena." Ma da-des tenî jey reydi şî. Ez bi xwi rey di biya. Kirdkî (Zazakî) qalî kerdînî. Weyra va "Şima etîya vindî, ez sôna zerre". O şî zerrey ziyareta Pîr Mesûrî, tîkî vindert, tepe ageyra hame. Va "Gurey ma ca nêgêno."

HERBÊ ŞEX SE'İDÎ DEST PEY KENO

Rojo bîn ma jey reydi şî Pîran. Ma şî dokinarê Alîndoqi (10), weyra yew aros perra, Şêxî va "Gurey ma herimiya."

Ay wextan Pîran nahîye bi, heway yew dewi bi. Mi vîr yeno, hima newe hukmatî yew qereqolo wurdèlek Mehla Cellan (11) di akerdi. İsmel [İsmail] Efendi Pîran di mudir bi, Hesen Huznî zî yuzbaşî û qumandarê qereqolî bi. İsmel Efendi Ma'denij (12) bi.

Şex Se'id ki hame, tanî meh-kumî zî ma rey kewtî, ê zî hamey Pîran. Mesela Welî Hediki, Hes-nî Bêzi, Şewşê Mehmedî, Hesi-kê Elikî, kulfetê İskî yanî Mehe-mî İskî û İsmelî İskî. Înîyan ra Welî Hediki û Hesenê Bêzi

Qelbînijî (13) bîy, Mehêmî İskî, İsmelî İskî û Hesikê Elikî Dê-reyişî bîy. Mêrdiman xeberi day qereqolî. Tanî vanî "Qelbîn ra İbremê Haj 'Elî ay wext cendirmewo bejik biyo, o şîyo xeberi daya qereqolî, vato 'Mehkumî Şêxî reydi yî, cûka cendirman visto ay keyî ser, weyre ra gûrî patlax dawo." Labrê ez bi xwi weş nêzana kamî xeber daya qereqolî.

Xeberi ki day qereqolî, yew zeftî (cendirme) hame şî Şex Se'idi heti, va: -Ma emirqulî yî, wa inî mehkumî ewta nêvindî.

Şêxî va: -Wa nêvindî, ci rî vindeni?

Mehkumî pey hesey, vist qereqolî Pîranî ser; tifingî pa nay, Hesen Huznî û İsmel Efendi tebîşti. Hewawo ki vanî "Birayane Şex Se'idi ra Şex 'Evdirehîmî inî mehkuman reydi misewre kerdo û paşî daya mehkuman, piya visto qereqolî ser."

Ma Pîran di bî. Şex Se'id û tanî axler-maxlerî, -yew ti ra vatînî Nebî Axa, o zî reydi bi-davîst tenî şîbî zerrey camî, ma zî teber a vindertî. Deyiso ki mi dî, berê qereqolî ver di "teq, teq, teq" vengê tifinganê jînî hame.

Şex Se'idi va "Inawa nêbeno, ina meki!" La hinî gure gure ra vêret. Ma hetanî mexreb vindertî. Xal 'Elî Temirê Dêreyişi mira va: -Hadî [ma şî] keye.

Ma: -Seredê mi gina.

Mi: -Qey?

Va: -Gure herimiya.

Ma tepe ageyray hamey, ven-gê tifingan dewam kerdînî. A şewi Şex Se'id û mērdimî ki reydi bî, Pîran ra vejiyay, ageyray şî.

ME VİST MA'DENÎ SER

Şarê inî cayanê ma heme yew-fek bi. Qezay ma Ma'den bi. Verî ma vist Ma'denî ser, ma Ma'den girot. Ma ki Ma'den girot, ma di-hîrê rojî weyra mendî. Ma da-des hebî neqlî (niqrî) ronay, heb te de girêna; ma eskeranê Şexî ay hebikî dekerdî çantandê xwi. Ma ay werdînî.

Serekê ma, ilerîgelanê ma bî. Mîrey Gêli (14) bî, axay Pîranî bî. Wir ca di, pilî ay cayan bî.

Şiyayışê ma ra ver, hukmatê Tirkan nîzdî panc sey ten şarê hetê Adiyemanî ardbi Ma'den ki nîverdî ma Ma'denî bigîrî. Ma ki

şî, ê pey beran di mendî. Zav banê ki ma te de bî, weranê (wâyiranê) jînî vatînî "Ayê ki sima ra ver verniya sima di ronişti ki sima bikişî, ha pey berî di." Ay dekerdîbî pey beran, nêewtanaynî jînî verra dî. Ay heme teslim bî.

ERQENÎ Dİ

Ma'denî dim a ma vist Erqenî ser, ma Erqenî zî girot. Erqenî di pillanê ma va "İnsan lêmin û lêşin o, veyşan o. Vila bî, herkes şerî key xwi û hîrê rojî vindî. Keye di çekanê xwi hedre biki, dim a bêrî, ma finenî Dîyerbekir (Diyarbekir) ser."

Beberi day Reşit Axay Tîrkan (15), Reşit Axay Gewran, şarê Mistan (16), şarê Corî (17), va "Hîrî rojî ra pey bêrî, ma ramenî Dîyerbekir ser."

Ma ki Pîran û Ma'den û Erqenî girot, axler-maxleranê ma weyra herinda hukmatî giroti. Mesela hetê Pîranî di Zîlfî Axay Pîranî, Huseynê Hejiki; Kirdasîyan miyan di Zîfqar Axay Tulxumî, Reşit Axay Tîrkan û axay inasarînî wiryew cay xwi di sermîn bî.

MA VİST DİYARBEKİR SER

Rojo ki vatbi "bêrî", ay roj ma duyes-hîrê tenî Dêreyişi şî Simaqî (18). Ma peye şîbî. Şarê Simaqî ti ra vejiyabî, ma odanî jînî di mendî.

A şewi ma şî çâqırni Suki (Diyarbekir) (19) ro girot. Zîfqar Axay Gewran ay kinar ra hame, tanî cêr o hamey, ma şarê Pîranî cor di şîy, tanî zî kinaro bîn ra hamey; ma dor-mare pi ro girot.

Zorê hukmatî şîyo, topâ antî bedenî ser, dor-marey xwi finenî, ma ra nanî. Ma zî enê tifing pa nanî, de topi pey tifingan vinde-na! İmkânî topan çinêbi. Yew çî vistînî qayme, roşn kerdinî, ma yew bi yew jînî ra hasaynî.

Weyra şarê hetê ma ra çind tenî kişiyay: Mesela Metînan (20) ra Hesenê Metînan, di tenî Zeydan (21) ra, yew ten Dêrey ra kişiyay.

Yew şewa tarî ya, çiyekî kê ra nêhaseno. Dîyerbekir ver di Aqînî (?) esta, ez û 'Elî biray xwi û tanî şarê mawo bîn ma weyra bî, guley topi ma ver di da piro. Aşma adar a (22), varan vareno, çomir o. 'Elî va: -İha, mi gina!

'Elî ki ina va, mi va: -Kurey to gina?

Va: -Seredê mi gina.

Mi destê xwi serey jey ra çar-na, serey jey sa'na, mi ina kerd ki gonî biyo la sewbî çî çino. Mi va:

-'Elî, destê mi pirr gûnî biyo feqet qulî-muli çîna, çîdo muhîm çîno.

Va: -Qey la indi dejenô?

Mi va: -Wilay gonî zav a, ez vana şîlê kerra wo.

Râşa zî şîlê kerra bi. Tikêna mend, imbazan va "Tepa ageyri!"

Yew qifley şarê Bottiyâ (23) Berê Mêrdînî (24) ra dekewî zerre. Înî yû eskerî geleki yewnan a kişî. Ma nêşîna şerî zerrey şaristanî. Peynî di ma remay.

HETA SÊWREKİ

Yew ray ma û terefdaranê hukmatî ma yewnan ver bi Sêwrekî berd, heta Qerebexçe (25).

Tanî 'esrefî bî, destâ hukmatê Tirkan girotûnî. Mesela heta Qerjdaxî di Ehmed Axay 'Ewêna bi,



Şex 'Evdirehîm (birayê Şex Se'idi)

jeysta hukmatî giroti. Ma mērdimanê jey reydi herb kerd. Elê Ehmed Axay 'Ewêna zav bi.

Ino be'nî cayanê bînan di zî tanî şêxî û axay vejiyay, yanî kerd, xwi vist kinardê hukmatî, hukmatî di weşî kerdî. Kam ki destâ hukmatî bibînî, hukmat zî kar bê aynan ewneyînî (hewniyayînî).

MA DİYARBEKİR RA REMENÎ

Dîyerbekir ver di zorê ma ki şî, ma sere bi pê ser na, ma vazday. Çomir-batirxan o, çaroxî ma pay di yî. Ha bebem, de bebem; şefeqî da piro, ma hamey a yew dewa Kirdasîyan, cenîyanê dewi wirkesi yew şewteki giroti, ma ver a hamey, va:

-Gi di gordê pêrdê şîma kerdo! Şîma key ma zî xerripna! Şîma remenî la ma se benî?

Ma ki hameynî, Şêxmalan (26) ra Şex Sîrac (27) zî ma reydi bi. Ma hamey Herbijini, va:

-'Eylekîn! Eske! Ningan (lingan) hewa nî! Hukmat awki di, Tepe di verniya ma gêno, ma hemînî hêşîr gêno!

Şex Sîrac espar bi, estora xwi xar day. Şêxî-mêxî esparî bî, ma peye bî. Ma hamey ki Tepe di çiyekî çino.

Ma hîrê sey - çar sey ten şarê inî kinardê ma bînî. Ma viyerti hamey lewyey Hîra Qeri, ma ewneyî ki yew espar ha cor di yeno, da-des peyey zî ha reydi. Ma me-raq kerd, ma va "ay ci kes o?"

Hame ki Reşit Axay Tîrkan o. Reşit Axay Tîrkan verî vatînî "Ino gure nêbeno, meki! Ma nişnî zorê hukmatî Tirkan beri." Ma ki hamey Dîyerbekir ser di, o zî hinî hame. Nêewtano weyra vindo, xwi pîze di vano "Înî şî, la ki zorê Tirkan berd û ageyray, mi kişenî." Cor di hame ki ma peyser di remenî, Kirdasî va:

-Hun ku da derin, hun ku da direvin? X... hespê xwe di dî û jina we kiriye! Wexta ku min digo "Nabe, nabe!", we digo "Reşit Axa teres e." De vegeerin em herin, de vegeerin! Hun ku da direvin? (28)

Welhasil ma hamey keye. Dim a hinî ma koyan kewtî. Ma perray şî Koy 'Erseki (29). Ma ay beytar di zav ezêt dî.

Dewamê ci esto.

(1)Dimli (Dibni): Yew dewa Pîranî ya.

(2)Vêrdan: Yew mezraya dewa Salurî ya, qezayê Pîranî ser o ya.

(3)Dêrey/Dêran: Yew dewa Pîranî ya

(4)Liji (Licê): Yew qezayê Diyarbekir o.

(5)Hêni: Yew qezayê Diyarbekir o.

(6)Kird: Kirmanc, Dimili, Zaza

(7)Hewawo ki Gêlijî vanî, Herbê Şex Se'idi miyan di rojê Zino Begi Gêlij yew Kirdi ra vano: -Şo mayîna (mahîna) mi biyari.

Kird nêşono û nengan Zinoy Begî çîneno, vano: -K... marda to ...! Eyro herb o. Ci rî ez mayîna to biyara? Ti şo mayîna xwi biyari.

(8)Qojigî (Qocigî): Yew dewa Pîranî ya.

(9)Pîr Mesur (Pîr Mensûr, Pîmsur): Vatişan gore yew ewliya biyo. Şerefnameyê Şerefşanê Bedîşî ra fahm beno ki nîzdi hezar serri ra ver ciwyawo. Tirba yê dewa Dêrey di ya û ziyaretgah a.

(10)Alîndoqi: Beytarê Pîranî û dewa Dêrey di yew ca wo.

(11)Mehla Cellan: Yew mehlaya Pîranî ya.

(12)Ma'den: Yew qezayê Xarpêti (El'eziżi) yo.

(13)Qelbin: Yew dewa Pîranî ya.

(14)Gel: Yew qezayê Diyarbekir o.

(15)Reşit Axay Tîrkan: Axay Tîrkan bi û dewa İbikan ra bi. Hewawo ki şarî miyan di vajîyêna, "Wextê İmperetoriya Osmanî di yê rî kurki am

Dûmahîka nivîsan

Tirsa wan ji prosesa demokrasiyâ...

ser pêşmergeyên PDK-Î û 3 pêşmerge kuştin. Hukûmet mecbûr ma bîryara valakirina deverê bide û bîryara xwe bi cî bîne. Çunki her hukûmetek çi merkezî, çi herêmî be, li gor qanûn û huquqnasîya navnetewî çar şertîn wê hene:

1- Yekem şertî dewletbûnê ew e ku erdekî te hebe. İro ji 2/3 ji erdê Kurdistanê hatiye rizgar kîrin û destê me de ye.

2- Divê mîletek hebe ku li ser wî erdi bijî. İro 3 milyon û nîv Kurd li ser erdê welaîte xwe dijîn.

3- Divê idareyek hebe. İro parlamento ya me heye, hukûmeta me heye, 15 wezaretîn me hene, bi dehhezar an memûrîn me hene.

4- Divê kontrola te li ser erdû sînorîn te hebe.

PKK'ê hewil da ku hemû şertîn dewletbûna me têk

bide. Xwest bide nîşan dan ku kontrola me li ser erdê me tuneye, idareyeke me tuneye.

Armanc: Di 29'ê Çiriya Pêşîn de peymanek di navbera hukûmetâ Kurdistanê û PKK'ê de hat imze kîrin. Ev peyman çi waciban dide ser milê her du aliyan?


C. Namiq: Di 29'ê meha 10'ê de Osman Ocalan hat, xwe teslimî hukûmetâ Kurd kir. Nêzîki 1300-1400 -bîzabit nîzanim- çekdarên wan jî teslimî hukûmetâ me bûn. Li gor peymanê, PKK'ê tev şertîn hukûmetê qebûl kirine. Wê neqlî cîhekî dûr bibin. Bi şertî ku hurmetê jî qanûnê Kurdistanê re nîşan bidin, dikarin li wir bimîn. Eger bixwazin biçin cîhekî din, rî ji wan re vekirî ye.

Armanc: Di gelek rojnameyên Tirkî û bi taybetî jî di weşanên PKK'ê de iddiayek hat belav kîrin ku Mesud Barzanî di telewîz-yona Kurdistanê de gotiye "Bijî Tirkîye, bijî leşkerê Tirk, bimre PKK". Li ser vê iddiayê hûn çi dibêjin?

C. Namiq: Ez bi xwe van tiştan wek iftîra û propagandayê dibînim. Lê di-xwazim tiştîkî bibêjîm. Demeke dirêj û ji gelek nêzîk ez Mesûd Barzanî nas dikim. Mesûd Barzanî heta iro negotiye "bijî filan û bimre filan". Kesêni ku Mesûd Barzanî nas dikin, dizanî ku bi "bijî" û "bimre" yan naopeyive. Ev iftîrayek e, perçeyek e ji propaganda reş. Ku wî bi xwe jî bi riya nûnerên partiya xwe, ev yek tekzîb kîriye.

Xaçepîrs

Amadekar: S. Rêving



ÇEPEKAST 1-a- Paşnav û pêşnavê serokê Parlamento Netewi a Kurdistanê li Kurdistanê başûr. 2-a- Di Kurmanci de pronavê işaretî ji bi kesê nîê. b- Kesê serî dikşîne, rîber. 3-a- Li Kurdistanê Sûriyê û Kurdistanê İraqê eşirek b- Kurtiya peyva 'Mister'. c- Daçekek. 4-a- Sînonîmeke 'daku', 'ji bona ku' (berevajî) b- Xeleka mezin ya zér ku keç û jîn di zendêne xwe dikin. 5-a- Her tiştî ku mirov zivistana ji bo germiyê dişewitîne. Bi Soranî dibêjin 'Sotemenî' (Berevajî) b- Sînonîmeke 'yan'. c- Ji navêne kuran 6-a- Roja berî iro. b- Sînonîmeke 'kok', 'rih' c- Li gundan havîne avê dixinê ku av sar bibe û bi piranî li hewşê ye. 7-a- Benik b- Çepera biçük c- Herfa yekem û siyem ji peyva 'dep'. 8-a- Terzi, yan mi-

rov pê dirûtinê dikin. b- Li devera Behdîna 'iro' (berevajî) 9-a- Gelek ji cîranê Kurdistan (berevajî) b- Sîni, tepsiya mezin. 10-a- Kesê pir girêdayî dînê İslâmê b- dewarek (berevajî). c- Herfa yekem û siyem ji peyva 'şew'. 11-a- Gotineke pîsê (berevajî) b- Cihêk ji laşê meriv (berevajî) 12-a- Ji navêne keçan. b- Rêbir, asî, eşqiya.

SEREJÊR 1-a- Ciayekî bi navû deng li Kurdistan Bakur ku dikeve nêzî bajarê Kexte. b- Menzere. 2-a- Erdê bi

Çepera: 1-a)erbil, b)en, c)kar. 2-a)yê, b)oçrih, c)ga. 3-a)abos, b)rêber. 4-a)zarife, b)úral. 5-a)zrex, b)xerîb. 6-a)hev, b)ve, c)mal. 7-a)xa, b)bîsmark. 8-a)of, b)ix, c)de. 9-lîmres. 10-îrbic êdilax. 11-a)nêrûmê, b)al. 12-a)ber, b)aras, c)ve.

Serejêr: 1-Eyaz zaxoli. 2-a)rêbar, b)afir. 3-a)oreh, b)mb. 4-sîxekirin. 5-a)lo, b)xecê. 6-a)crex, b)sêra. 7-a)jerê, b)evîn, c)dûr. 8-a)nibûres, b)çima. 9-a)herî, b)mê, c)lês. 10-a)rabma, b)ba. 11-a)ag, b)ard, c)xav. 12-a)ran, b)elkeh, c)le.

Seredana Delegasyona Parlamento ya Kurdistanê bo Swêdê

Heyetek Parlamento ya Kurdistanê Iraqî de bin Seroktiya Serokê Meclîsa Kurdistanê Cehwer Namiq Salim de di 14'ê Çiriya Paşin de hat Swêdê. Di heyetê de Parlamente YNK û cîgirserokê grûba Parlamente Yekîtiyê Sadî Pirê, Parlamente PDK'ê Muhammed Hama Caf û Parlamente Tevgera Demokratik ya Asûriyan Francis Yusuf Sabo cî girtin.

Heyeta Parlamento berî bîn Swêdê li Almanyayê û Swîsrê jî bi Serok û cîgirê serokên parlamento wan welatan re hevdîtin çêkirbûn.

Heyet li Swêdê bi cîgirê serokê Parlamento Swêdê, Bertil Fiskejö re û bi serokê Komîsyona Karê Derve yê parlamento Swêdê Daniel Tarschys re rûniştin. Serokê Partiya Folk(gel) Bengt Westerberg, berpirsiyare Partiya Center Per Grastedt û Cigirê serokê Partiya Venster(Cep) Gudrun Scyhan jî heyeta Kurd qebûl kîrin.

Heyeta Parlamento di 17'ê Çiriya Paşin de bi berpirsiyaren Hevkariya Hêzîn Kurdistanê li Swêdê rûnişt û li ser

Kurdistanê agahdarî da wan. Axaftina Parlamente Yekîtiyê Sadî Pirê balkêş bû û rewşa aboriya Kurdistanê bi faktâ anî zimên. Wî digot; "Measê mamos-teyekî li Kurdistanê heqê çar fîncan qehweya li çayxaneke Swêd e. Nîv mîlyon însanên me bîhna çayê ji bir kirine û mehê carekê ançax karin birincî bixwin. Rêberiya PKK'ê di vî warî de gelek rola xwe list."

Federasyona Komelê Kurdistanê li Swêdê şevel xwarinê ji bo heyetê amede kir û di şevê de berpirsiyaren hêz, Komele û şexsiyetên Kurdish besarê şevê bûn. Di 20'ê Çiriya Paşin de jî heyeta Kurdistanê civînek ji bo Kurdên Swêdê çêkir; zêdeyi hezar kes besarî civînê bûn. Serokê Meclîsê di civînê de li ser pirs û pirsêgirêkê Kurdistanê sekîn û bersivêne pirsên guhdaran da.

Rojnama me Armancê bi serokê Meclîsa Kurdistanê Cehwer Namiq Salim re hevpeyvînek çêkir. Em Hevpeyvînê di rûpelên 6 û 7'an de diweşînin.

Civîna Wezîrên Derve...

pozitif li vê civînê nîhîrt û encamê wê pejirand.

Opozîsyona Iraqê li dijî vê civînê derket û got civîneke ku li ser qedera Iraqê tê çêkirin, bêyî ku besdariya temsîkarên wan

Helwesta Rojava û DY'A'ê

Piştî bang Tirkîyê, Amerika û Ingilîstanê jî ji Tirkîyê re teklîfa civîneke di vê çerçewê de bir. Pêşniyara wan ew bû ku bila DYA, Ingilîstan, Fran-

sa û Tirkîyê li ser rewşa "Başûra Iraqê" bi hev re civînekê çêkin. Lê Tirkîyê ev pêşniyar qebûl nekir.

Amerika û Ingilîstânê him berî civîna Wezîrên Tirkîyê, Iran û Sûriyê, him jî piştî civînê helwesta xwe eşkere kîrin ku ew civînê wiha, bêyî ku ew di nav de bin, teswîb na-kin. Û hîn wezîrên Iranê, Sûriyê li Enquerê bûn, Sefareta Amerika yê Enquerê tavilê li ser vê civînê informasyon ji Serokwe-

Lewend Firat

Elîfba Kurdî xwedî destûr e

vêni biyanî bi kar bîne û ew kesê ku bixwaze van peyva bi kar bîne, dikare bêyî ku elîfba biguhere jî bi kar bîne weka nuha di nav nîvîsîna bakurê Kurdistanê da tê bikaranîn, weku: (Saîd, Ahmed, Alî, hesab û Omer) bi rastî jî bi vî awayî ye: (hetav, hemî û ewir) û nabe ku hem em wan peyvîn Kurdî bihêlin, li ser wê çewtiyê û hem em

2) Hinek peyv û pîten din jî hene ku ew bi xwe Kurdi ne, lê li hinek deveran bi çewti têne guhertin, wek ('hetav, 'hemî û 'ewir) ku hemî peyvîn Kurdi ên resen in û rastiya wan jî bi vî awayî ye: (hetav, hemî û ewir) û nabe ku hem em wan peyvîn Kurdî bihêlin, li ser wê çewtiyê û hem em

elîfba xwe jî li gorî wan çewt bikin. Her wesa pîta (K) a ku kak P. Cihani bi du awayî nîvîsî ye bi dîtina min cudayıyeka wesa di navbera dengen wê de nîne ku em neçar bibin, bikine du pît û bi dehan sal e ku piraniya Kurdan her bi yek pîte (K) dînivîsin û tu giriftariyek jê peyda nebûye.

Hatip Kapçak (Xebat) hate şehîdkirin

Têkoşerê serbilind, şoresgerê hêja, dozdarê têkoşîna rizgarîwaz û azadiya gelê Kurd, pêşengê bi rûmet, endamê Komîta Navendî yê Rizgarîwazên Neteweyî yê Kurdistanê (RNK-KUK-), Hatip Kapçak (Xebat) di 19'ê Çiriya Paşin ya 1992'an de li Mazidaxê bi destêne hêzîn tarî û qirêt yê dijmin hate şehîdkirin.

Bila serê gelê Kurd sax be. Têkoşîna heval Xebat di têkoşîna gelê me de dijî

Rizgarîwazên Neteweyî yê Kurdistanê (RNK-KUK-) liqê Ewrûpa

Elifba Kurdi xwedî destûr e

Rizgar KESTEYI

Perwiz Cihanî nivîsevanekî genc e ji rojheletê Kurdistanê. Ji xebatê wî 'roman, helbest, folklor û rîziman' pêş çavên xwendevanen dikevin û herwesa berpirsê pişka Kurmancî yê kovara "Sirwe" ye ku çend sal in bi serketû li bajarê Ormiyê, li rojheletê Kurdistanê ji layê weşana Selaheddinê Eyübî ve tête weşandin.

Li vê dawiyê pirtükeka vî hevalî bi navê "Fêrbûna rênivisa Kurdî bi dû şeweyan" ku ji 51 rûpelan pêk hatiye, qeware na-vendî û di sala 1992'yan de ji layê weşanen Selaheddinê Eyübî ve hatiye weşandin.

Wek xuya meriv tê digihê ku pirtük xebatek e ji bo ku xwendevan li rojheletê Kurdistanê bikaribin xwe pê hînî elifba Latînî bîkin, herwesa meriv dikare bêje ku Kurdîn bi elifba Latînî jî dixwînin, dikarin bi rîka vê pirtûkê xwe fêri elifba Erebî bikin.

Lê li gor min ziyana vê pirtûka kak P. Cihanî jî ne hindik e. Ji ber ku wî di pirtûka xwe de li gorf xwestina xwe 7 pît (tip) li elifba Kurdî zêde kirine, ku wan pîta tû têkilî bi zimanê Kurdî nîne. Û bi vî awayî hejmara pîten Kurdî ji 31'an bûye 38 pît. Pîten ku zêde kirine ji bi vî awayî ne:

'i-ئ, 'a-ئ, 'e-ئ, 'i-ئ, 'e-ئ
k-ئ, h-ئ.

Elifba ku zanayê Kurd Celadet Bedirxan daniye ji 31 pîtan pêk hatiye.

Kurdîn ku bi Latînî dinivîsin tev li dû vê elifbayê diçin û pê dinivîsin û zimanê Kurdî bê asteng û kîmasî pê tê dinivîsin. Ji ber

Dûmahûk r. 11



wê yekê elifba me pêdîvî tu zêde-hiyêni bi vî awayî nîne û eger rojekê rîziman û elifba Kurdî pêdîvî bi hînek guherîna hebe, nabe ku her kes ji me li mala xwe guherîna û kîmasî û zêdehiya lê bike. Belkû divê zimanzan û dezgeh û yekîtiyên nivîsevanenê Kurd bi hev re danûstendina bikin û guherînên pêdîvî bi awayekî zanistî encam bidin, da ku xizmeta ziman bikin, ne ku astenga ji bo peyda kin.

Disa ev pîten ku kak P. Cihanî zêde kirine, tu têkilî bi zimanê Kurdî ve nînin, rast e hînek cara dengen bi vî awayî di Kurdî da peyda dibin, lê ne mana wê ew e ku ew deng yan pît Kurdî ne.

1) Belkû ew pît yan biyanîne, wekû ('Emir-ئ', 'Hal-ئ') ku hem peyv û hem pît ne Kurdî ne û Kurd pêdîvî nînin rîziman û elifba xwe tev ji bo ku çend pey-

Dûmahûk r. 11

JI ROHAT DU PIRTÜK




Rohat, Ziya Gökalp'in Büyükkilelesi: Kürtler (Jana Ziya Gökalp Mezin: Kurd), Weşanxana Fırat, 141 rûpel, Stenbol, 1992.

Ziya Gökalp (1876- 1924) bi xwe Kurd e û li ser rewşa civakî ya Kurdan û zimanê Kurdî xebitiye. Lê bi taybelî pişti 1909'an bi awakî aktif di nav refîn Îttihad û Tereqqîyê de cî girtiye û bûye yek ji mezintirîn iđeologî Turkîzm û Turanîzm. Nivîskar di vê lêkolîna xwe ya nuh de wek keski problematik bîr û baweriyen Ziya Gökalp yê li ser Kurdan analîz dike.

Rohat, Yaşar Kemal'in yapıtlarında Kürt Gerçek -Çukurova-Van karsılığının çatısı (Di berhemîn Yaşar Kemal de rasiya Kurda -Banê dijayedîtiya Wan û Çukurovayê) Weşanxana Fırat, 178 rûpel, Stenbol, 1992.

Lêkoliner Rohat, di vê lêkolîna xwe de wek wê ji navê pirtûkê jî bê fêm kirin li ser Yaşar Kemal û berhemîn wî radiweste. Di berhemîn wî de tesîra kultura Kurdi û tipen Kurd wek du besen taybelî di lêkolînê de cî girtine. Herweha bi sernîvisa "Ceneta ku Yaşar Kemal afirandiye: Wan" beşeke din ya lêkolînê heye.

Nivîskar herwisa di mesajîn politik yê Yaşar Kemal de jarîtiya Kurdan derxistiye ber çavan.



BEROS



Mahmûd Lewendî

Ji % 98'ê ronakbirêne me ji Tirkî hez dîkin!

Li Kurdistanâ Bakur di salen 1913'an de ronakbirêne Kurd li İstenbolê bi navê Yekbûn, Jîn, Roji Kurd, Hetawî Kurd gelek rojname û kovar derxistin. Zimanê rojname û kovaren wan nîvî bi Kurdî û nîvî jî bi Tirkî bû. Paşê hêdî hêdî tenê bi Tirkî, an jî hin nivîs jî bi Kurdî derxistin.

Bi qasî ku em pê dizanin, ji destpêka 1900'i heta 1980'i li Kurdistanâ Bakur, Kurdan 76 kovar û rojname derxistine ku ji wan tenê yek xurû bi Kurdî bû, ew jî di 1979'an de bi navê Tîrêj derket, yê din dîsa hemû bi Tirkî bûn. Yanê ji % 99 bi Tirkî, ji 1 bi Kurdî derketine.

Piştî 1980'yî Kurdan dîsa dest bi derxistina rojname û kovaran kirin. Ji 1984'an û vir de li Kurdistanâ Bakur nêzîkî 40-50 kovar û rojnameyên Kurdî derketin ku ji wan hînek hê jî berdewam in. Lê ji nav van tenê Rojname û Welat ne tê de, yê din dîsa hemû bi Tirkî ne.

Ci ecêbek mezin e, bifikirin, milletekî nêzîkî 15 milyon insan, di na 6-7 salan de ronakbirêne wî milleti bikaribin 40-50 kova-

ran derxin ku tenê du heb ji wan bi Kurdî bin, yê mayî bi Tirkî bin. Yanê ev tê wê maneyê ku ji % 98'ê ronakbirêne nivîskarêne Kurdan naxwazin bi Kurdî binivîsin, bi Tirkî dinivîsin.

Îcar milletê me yê feqîr jî dixwaze bîzabibe ka ronakbirêne wî ci dibêjin. Lê ji bo ku ji ronakbirêne xwe fêm bike divê ku pêşî fêri Tirkî bibe. Yanê bi nezanî em milletê xwe asimîle dîkin. Îcar li alîyekî din ji em radibin fortê xwe didin û dibêjin "gerek em li dijî asimîlasyonê rawestin". Yanê ci? Gotinê hîc û pûc!


Li gor reqemê ku me li jorê nivîsine Kurden Kurdistanâ Bakur ji destpêkê heta nuha nêzîkî 132 kovar û rojname derxistine ku ji wan tenê 3 heb bi Kurdî ne. Û rewşa zimanê me jî li ortê ye.

De îcar eksê wê bifikirin. Gelo ji wan 132 kovar û rojnameyan ger sê heb tenê bi Tirkî û yê mayî jî bi Kurdî bana, ma rewşa zimanê me wê wek iro ba?

Nûgörmîş û nûlixwehaydarolmîş!

Ji alî naveroka xwe ve sewîya Kurdiya Dimili ya ku iro tê nivîsin hê jî negîhiştîye Dimiliya ku berî 1980'yî ku di kovar û rojnameyên Tîrêj, DDG, Özgûrlük Yolu û Roja Welat de dihatin nivîsin.

Îcar iro hin "nûgörmîş" û "nûlixwehaydarolmîş" rabûne dibêjin: "Berê bi Dimili nedihat nivîsin, cara pêşî me dest pê kirîye, em bi Dimili dinivîsin" û bi ser de jî rabûne li gor "aqil" ê xwe "elfabeyek nû" jî çêkirine.



Ji rojnameyên Tirkî:

"Wezirên Karûbarê Derve yê Tirkîyê, Sûriyê û Îranê ji bo musteqbela Kurdistanâ Iraqê civîyan".

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgin

□ Li dinê di salekê de, ji ber ducanî (bi hemlebûnê) û zarokanînê nêzî 500.000 jin dimirin.

□ Saeta ku me ji xew radike û şiyar dîke- saeta bi zîl, saeta bi alarm- cara pêşî di sala 1847'an de ji ali alîmê Fransız yê bi nav û deng Antonie Redierê hatiye ditin.

□ Wek tê zanîn bi biryara Netewên Yekgirti kuştina filan qedexe ye. Fil ji bo diranen xwe tênu kuştinê û diranen wan pir bi qîmet in. Lê di piyasê de diranen filan kêm nabin. Sebeba vê yekê, xezîna diranen mamütêne di bin qesaya Sibiryayê de ye. Diranen mamütan ku navbera 10.000 û 40.000 sal bi emr in, di nav gilasîyeren qesagirti de gelek hene; li gor texminan 600.000 ton.

□ Radiuma ku radioaktiv e di sala 1898'an de ji ali Marie S. Curie hat dîtin. Radium di başkirina nexweşina kanserê de tê bikaranînê.